

ELÎXANÊ MEMÊ

Elîxanê Memê. Helbestkar, rojnameger, çandnasê êzidahiyê, siyasetmedar. 6ê hezîrana 1948ê tê dinyayê. Sala 1967ê dibe xwendekarê beşê rojnamevaniyê li Unîwersîteya Dewletê ya Yêrêvanê. Sala 1973yê xwendina xwe kuta dike û hetanî 1979ê di rojnameya *Piyoner Kançê* de, piştê du salan di kovara *Hayastanî Aşxatavoruhîyê* de bi dû re jî bi qasî 8 salan di weşanxaneyê Sovyetekan Groxê de dixebite. Sala 1990ê dibe parlamenterê bajarê Yêrêvanê di meclisa Ermenistanê de. Yek ji wan ronakbîr/ siyasetmedarên serkêş e ku bi hewldanên saziya Yekbûnê û Wekîl Mistefayev, 7ê hezîrana 1992yê damezirandina Kurdistana Sor radigîhinin. Edîtoriya rojnameya *Zagrosê* kiriye û ji bo serokatiya Komeleya Nivîskarên Kurd a Ermenistanê hatiye hilbijartin. 12 kitêbên perwerdehiyê ji bo zarokên kurdan amade kirine. 12yê kanûna pêşîn a 2016yê ji ber nexweşiya pişikê kiras guheriye.

Hin berhemên ku li dû xwe hiştine ev in: *Kênas Sov* (Derya Jiyanê), 1983; *Kar* (Kevir), 1983; *Surra Hisretê*, 1989; *Arêvî Yêrkîr* (Welatê Rojê), 2004; *Ax û Nan*, 2004; *Zagrosî Luyîserî* (Nûrên Zagrosê), 2006; *Nûranî*, 2010; *Yerkxosutyun* (Dialog), 2013.

PALL WEŞAN
Edebiyat | Helbest

Surra Hisretê
û çend helbestên din
Elixanê Memê
(1989, **Yêrêvan**)

Amadekirin: Ferec Koyistanî

Edîtor: Yehya Omerî
Berg: Emîr Tahir
Mîzanpaj: Pall

Çapa Yekem: 2023, Diyarbekir

© PALL | Naîrî Mûsoyan | 2023
Ji xeynî danasîne, çênabe bêyî destûrê bê kopîkirin.

ISBN: **978-605-72217-2-8**
Sertifika No: 66649

Çapxane: Meteksan Matbaacılık ve Teknik San. Tic. A.Ş.
Beytepe Köy Yolu No: 3
06800 Bilkent-Çankaya / Ankara
Sertifika No: 46519

Pall Yayıncılık
Kooperatîfler Mah. Rızvan Ağa 2. Sk. No: 2/2, İç Kapı No: 1
Yenişehir / Diyarbakır

www.pallwesan.com

✉ info@pallwesan.com

🐦 [pallwesan](https://twitter.com/pallwesan)

📷 [pallwesan](https://www.instagram.com/pallwesan)

SURRA HISRETÊ
û çend helbestên din

ELÎXANÊ MEMÊ

pall

Naverok

Ji dêvla Pêşgotinê, 7

SURRA HISRETÊ, 19

Hatibûme Çiyê, 21

Xelayî, 22

[Dijminê Xwe ra], 23

Mêvanê Hertimî, 24

Kê ku Bêje, 26

[Xwedê Ruh Daye], 27

[Par Wî Çaxî], 28

Kilama Sor, 29

Klêopatira, 30

Hub û Dua, 32

[Min Hespê Xwe], 33

[Orta Me da], 34

Ruhê Çiya, 35

[Dûr va], 36

Ballad Derheqa Konê Me, 37

[Silav Da], 38

[Ez Bêy Te], 39

Çawa Peyayî Ser Erdê Bûm, 40

[Hergê Xwey ke], 44

Kurdek, 45

[Çiya Spî Bû], 46

Dinya Min, 47

Filankes û Bêvankes, 80

Helbestên Wî yên di Rojnameya Riya Teze de, 103

Dilê Min, 105

Êvara Çiyê, 106

Spindar Îşev, 107

Helbestên Wî yên di Berhevoka 2yem a Bahara Teze de, 109

Kevir, 111

[Tu Zanî], 115
[Anî, Difirim], 116
[Ev Dinya Hêk e], 117
Kilama Şivan, 118
Mîstêrya, 121
Kilama Hûrmûra ye Kevin û Teze, 122
Hêraklît, 123
Talês, 124
[Bêyî Çiya-Zozan], 125
Zimanê Min î Dê, 126
[Ez ber Mêzîna], 127

Helbestên Wî yên di Berhevoka 6em a Bahara Teze de, 129

Zimanê Dê, 131
[Ser Zinarê Hişk Guleke Bedew], 133
[Çiya û Çiya], 134
[Diya Min], 135
[Ji Serê Çiyê], 136
[Îdî Çend Sal e], 137
[Bêyî Yarê], 138
[Kaxezekê Hilde], 139
Huba Salê, 140
Hevtbend, 141
Zînê, 143
[Çiyayê Bilind in], 144
[Min Kiras Çêkir], 145

Helbestên Wî yên di Kitêbên Perwerdehiyê de, 147

Wê Rabe Madî, 149
Dît, 151
Lêgênda Axê, 152
Dimdim Diteqe, Dîsa Diteqe, 154
Şayîr, 157
Çito Çiya me?, 158

Helbestên Wî yên di Çanda Kurdên Sovêtê de, 159

**Ji dêvla Pêşgotinê:
Vegerandina Helbestkarekî li Welêt
an jî Hewldana Lêkirina Dîwarên Navendekê**

Elîxanê Memê. Helbestkar, rojnameger, çandnasê êzidahiyê, siyasetmedar. Li gorî hevpeyvînekê ya ku sala 2012yê pê re hatiye kirin; pêşiyên wî yên ku ji ezbeta Qezan in, ji gundê Xezeriye yê Farqînê bar kirine gundê Soybilaxê –îro roj bi ser Qulpa Îdirê ve ye– yê Deşta Sînegê ya li herêma Surmeliyê. Piştî Şerê 1em ê Cîhanê, sala 1918ê, dema ku rûs ji Serheda Kurdistanê vedikişin û tirk bi ser herêmê de digirin, malbata wî jî dibe yek ji wan malbatên kurdên êzidî, yên ku Çemê Erezê derbas dikin û diçin li aliyê din ê sînor bi cih dibin ku îro roj nav lê Komara Ermenistanê ye.

Digel ku di nav re çend carên din vedigerin gundê xwe yê li *Sînega Êzdîya** jî ji sala 1922yê û bi şûn de nema dikarin vegerin; ji ber ku sînor yekcar tên asêkirin. Serê pêşî, li gundê Diyanê yê bajarokê Talînê bi cih dibin. Lê ji ber ku apekî wî di Şerê 2yem ê Cîhanê de li Macaristanê tê kuştin û bavê wî bi tenê dimîne, îcarê Diyanê jî li pey xwe dihêlin û diçin gundê Koşê. Bavê wî li Koşê dizewice û ew wekî nûxuriyê dê û bavê xwe, 6ê hezîrana 1948ê tê dinyayê ku bi dû re xwişkek û 4 bira jî dê li wan zêde bibin.

Çaxê ku 7 salî ye, li gundê xwe Koşê dest bi dibistanê dike û sala 1967ê dibe xwendekarê beşê rojnamevaniyê li Unîwersîteya Dewletê ya Rewanê. Sala 1973yê xwendina

* Rohat Alakom, "Sînega Êzdiya", <https://www.nupel.tv/rohat-alakom-sinega-ezdiya-107380.html>.

xwe kuta dike û hetanî 1979ê di rojnameya *Piyoner Kançê* de dixebite ya ku weşana wê ji bo zarokan e, piştî du salan di kovara *Hayastanî Aşxatavoruhîyê* de dixebite ku weşana wê ji bo jinan e û bi dû re bi qasî 8 salan di weşanxaneyê *Sovyetekan Groxê* de dixebite, zimanê weşana her sê saziyan jî bi ermenî ye.

Dema ku dawîya salên 1980yî Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst (YKSS) ber bi belavbûyinê ve diçe û Ermenistan dibe komar/dewleteke serbixwe, sala 1990ê, dibe parlamenterê bajarê Rewanê di meclisa Ermenistanê de; her çaxê xwe yê parlamenteriyê dibe endamê komîsyona mafên mirovan û yên neteweyên kêmpar. Hêjayî balpêbirinê ye ku Elîxanê Memê yek ji wan ronakbîr/siyasetmedarên serkêş ên Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst bû ku bi hewildanên saziya *Yekbûnê* û Wekîl Mistefayev, 7ê hezîrana 1992yê damezirandina Kurdistanê Sor radigîhinin, ya ku wekî parçeyê 5em ê Kurdistanê mezin jî tê zanîn. Deqa kurdî ya ragihandina Kurdistanê Sor ji aliyê Elîxanê Memê ve tê xwendin û ew wekî şûngirê serokê wê, Wekîl Mistefayev tê diyarkirin.*

Ji sala 2007ê ve heta koça xwe ya dawî edîtoriya rojnameya *Zagrosê* dike û dîsa her ji 13yê nîsana 2012yê ta koça xwe ya dawî, ji bo serokatiya Komeleya Nivîskarên Kurd a Ermenistanê tê hilbijartin. Serokkomarê Ermenistanê yê hingê Serj Sarkîsyan, 23yê gulana 2012yê, wî bi madalyaya dewletê *Movsês Xurênastîyê* perû dike. Wextê ku 6ê çiriya paşîn a 2012yê li Ermenistanê perwerdehiya zimanê kurdî ya bi alfabeya latînî bi awayekî fermî dest pê dike, ji bo zarokên kurdan 12 kitêbên perwerdehiyê amade dike.† 12yê kanûna pêşîn a 2016yê ji ber nexweşiya pişikê kiras diguhere, 14yê kanûna pêşîn a 2016yê li gundê Şamîranê li cem dê û bavê

* *Dîroka Kurdistanê Sor*, Der. Salih Kevirbirî, 2014, Rûdaw.

† “Li Ermenistanê bi awayekî fermî bi Latînî perwerdeya kurdî dest pê kir”, <https://diyarname.com/news.php?ldx=6414>.

xwe bi axê tê spartin.* Wî, ji bilî her 12 kitêbên perwerdehiyê yên navborî, ev berhem li dû xwe hiştin: *Kênas Sov* (Derya Jiyanê) 1983, *Kar* (Kevir) 1983, *Surra Hisretê* 1989, *Arêvî Yêrkîr* (Welatê Rojê) 2004, *Ax û Nan* 2004, *Zagrosî Luyîserî* (Nûrên Zagrosê) 2006, *Nûranî* 2010, *Yerxosutyun* (Dialog) 2013.†

Daxwaza xwederbirrînê û lêhaybûna li wê kêliyê ku bihîzer/xwendevan fêhm dikin ji wê daxwaza xwederbirrînê; pê re jî xwe bi fêhmkirin dayîne, kurmek e heçku û ew ê ji wê hingê ve di me geriyabe, ji hinga ku em “mirov” li hev baniyan û me bi hev re dest bi jiyînê kir, me bi hev re dest bi parvekirina tiştine dî jî kir ên ku rê xweş kirin li vî kurmê me yê ku pê çandek bi gewde bû ji mirovatiyê re û şax çûn ji wî gewdeyî; ji şaxan jî çiql digihîjîn, baş û xerab.

Lê, bêrî ji tevliivîna mirovatiyê, ya ku hinekî bi xêra vî kurmî heye –û herweha pirrî daran gelekî însanî ye û avzêmkî kirinên baş û bedew e seba silametiya vê gerestêrka me– çaxê peyv tê ser me kurdan, nexasim jî tê ser wêjeya me ya modern; em bi ser ve dibin ku ev kurmê me, daxwaza me ya xwederbirrînê hatiye/tê pêpeskirin ji aliyê wan dewletan ve yên ku hew dikarin hebin; bi tunekirina me, li ser tunekirina me yan jî hebin ji bo tunekirina me, evên ku ji bilî sînor, asaq û tevkujiyên xwe, herweha nehiştine neteweyê kurd kêliyêkê jî bihêwire li ser axa xwe û seraqet berê me dane nefîtiyê û sirgûnan. Ev diyardeya domdar sebeb e ku wêjeya modern a kurdî hêlînek, navendek çênebe û li ser dilê rehet negihîje xerîdarên xwe, ji lew re –serera “navend”bûna wan bervekirî ye jî ji bo şiroveyan– gava em çêl bi wêjeya mo-

* “Elîxanê Memê hat oxirkirin”, <https://diyarname.com/news.php?Idx=25146>.

† Elîxanê Memê, *Ziman û Wêjeya Kurdî (Kurmançî) Pirtûka 6-A*, Weş. Spîka, Yêrevan, 2014, r. 96.

dern a kurdî dikin, em wê li tibabek paytextan digerrînin ku dûr in ji welêt: Qahîre, Stembol, Şam, Bêrûd, Yêrevan, Parîs, Stokholm û wd. Û tevî ku çendîn dîroknasên kurd ne li ser wê qenaetê ne jî ku kurd ji derine di çûbin Pişt-Kavkazê – bêguman baweriya me jî li ser vê yekê ye– û niştecihbûna me ya lê vedigerînin sedsala 7em a beriya zayînê û lê zêde dikin ku kurdan di navbera salên 951-1164ê yên zayînê de dewleta Şedadî ava kiriye jî (ji bo vê mijarê çav bigerrînin li xebatên Hejarê Şamil û Îbrahîm Sediyanî), lê mixabin ji ber bêbîrhiştina kurdan a ji teref dewletên serdest ve, winda ne belgeyên nivîskî yên ku me kurdan di wan de hebûna xwe ya li wê herêmê gihandibe roja îro.

Ji lew re, dema ku ji van paytextan em wêjeya kurdî ya modern li Yêrevanê digerrînin, weke êwî/qonax qal dikin; para pirtir mebest jê berhemdariya wê dema di navbera salên 1920-1992yê de ye. Û berhemdêrên pêşçav ên ku werareke mezin di wêjeya kurdî de an jî bi giştî di xebatên kurdnasiyê de pêk aniye, ew kesên bi piranî ji dînê êzidayiyê ne ku bi xwe yan jî bi kêmanî dê û bavên wan an jî kalik û pîrikên wan di êrîşên tirkên ên di navbera salên 1918-1926ê de hatine kuştin û bêgav mane ku ji Serheda Kurdistanê berê xwe bidin herêmên çiyayî yên Ermenistanê. Tevî romana ewil, çîrok û şanomeyên ewil, xebatên mezin ên berhevkarîya berhemên folklorê kurdî, rojnameya tewrî temendirêj a bi kurdî *Riya Teze*, radyoya kurdî ya Yêrevanê ya ku dengbêjên wê bi salan dilê me kurdên bakur jî hênik kir; em welê yeqîn in ku berhevokên (almanak) wan ên wêjeyî yên bi awayekî periyodîk dihatin weşandin, kêmtên naskirin li nav me bakuriyan. Almanakên wêjeya kurdên Kavkazê/Rewanê, yên ku navê wan ekseriyet “Bahar” an jî “Bahara Teze” ne, her sala ku dihatin weşandin berhemdariya bi gelek lewnên wêjeyî ya salekê li xwe digirtin. Cudahiya wan a ji kovar/rojna-

meyekê ew e ku mîna puxtêya afirandina wêjeyî ya salane bûn. Texmîna me li ser wê yekê ye ku ev almanak hew bi tenê dê ne xweserî kurdan bin û ew ê cureyekî afirandinê yê bi zimanên dî jî be ku li komarên Sovyeta Sosyalîst dihatin axaftin û bi wan berhemdariya wêjeyî dihat pê û herweha dîsa em wilo texmîn dikin ku dê ev yek ne bêrî be ji politîkayên birêvebirinê yên YKSSyê. Bi raya me; ve-weşandina van almanakan a li bakurê Kurdistanê û lêkolînên li ser naveroka wan, dê rêyê li dîroknasên wêjeyê xweştir bike, dê bibe kevirekî din ê hewildana me ya lêkirina dîwarên navendekê û wekî din jî dê deqên îlhambexş hebin di wan de ji bo wêjekarên me yên bakurî.

Rêya me û Elîxanê Memê jî leqayî hev hat di yek ji almanakên bi vî rengî de: Berhema wî ya ewil a ku em bi ser ve bûn *Surra Hisretê* bû ku weke kitêb bi tevahî di almanaka "Bahara 8" em a sala 1989ê de belav bûbû. Ji wê biservebûna me û veğerandina dengê dilê wî gelek wext bihurî. Serê pêşî hizra me ew bû ku em bi tenê *Surra Hisretê* ji alfabeya kirîlî veguhêzin û ji weşanê re amade bikin, lê bi pêşniyazan bi me çêtir hat ku ev hizra me wekî bijarteyeke ji helbestên wî berfirehtir bibe. Û Xwedê kirî ev pêşniyaz jî li me hatin kirin, ji ber ku çî di almanakên berî ya 8em de, çî di çend helbestên wî yên ku di rojnameya *Riya Teze* de belav bûbûn û çî jî di çend helbestên wî yên di kitêbên perwerdehiyê de ku wî, berî koça xwe ya dawî ji bo zarokên kurd ên li Ermenistanê amade kiribûn, me pêwendiyêke dilînî bi poetîkayeke pihêt re danî ku digel vexwarina ji kevneşopa helbesta kurdî ya berî xwe û herweha çanda kurdî ya devkî ya dêrîn, wê di ber re heta mirov bêje bes ji çanda dêrîn a feylesofiya yewnanî û pê re jî ji mîrateya helbesta modern a welatên dereke jî tehm kiriye; yek ji delîla sereke ya van temayên mewzûbehs ew e ku xwediyê vê poetîkayê Elîxanê Memê, şiyaye helbestekê ji

bo romannivîsê mezin Dostoyevskî binivîse.

Şik jê tune ye ku ji qirnên kevn û heta dema me jî li ser armanc û bêarmanciya hunera helbestê gelek gengeşî û lêkdan hatine kirin û welew armanca helbestkariyekê “bêarmancî” be jî, zehmet e ku mirov axiriyê wê “bêarmanciyê” jî weke armancekê nexwîne û jixwe nexasim ji bo rewşa helbestkariya me ya bi kurdî/kurmancî, zehmeta ser zehmetê ye ku behs ji poetîkayêke bêarmanc vebe. Di vî biwarî de ya ku Elîxanê Memê yê helbestkar ava kiriye jî, ne “bêarmanc” e, refekî zengîn ê “*dubendiyên hebûna mirovî*” yê ku çêdibe wekî “*başî-xerabî*” bê kurtkirin, di piraniya helbestên wî de darîçav dibe. Herçendî yekcaran zêde îdeal û di hinekan de ast piçekî dîdaktîk bixuye jî, ew dudilî nabe; ji vegêraneke navxweyî berê xwîner bi ya “baş” ve dike, wan han dide ku ew alîgirên başiyê bin di leca başî û xerabiyê de. Jêder û bandora vê armanc û handana wî heçku mîrateya çanda devkî ya kurdî ye û ji dîne êzidîtiyê tê ku ew jî endamekî wê ye û herweha bi nav-anîna xwe ya “*Şems*”, “*tav*” û hwd –ku sembolên pîroz ên êzidahiyê ne– mirov hay lê dibe bê êzidahiyê çiqasî bandor lê kiriye. Jixwe, belkî ji bo helbestkariyê şertekî ewil û bivênevê be naskirin û hezkirina ji çanda xwemalî û helbestkariya Elîxanê Memê jî têra xwe heqê vî şertî daye, bi çanda kurdî hatiye avdan an jî ruh-dan.

Ev bijarteya li ber destên we, bi tenê ji kurdiya vê poetîkayê pêk nayê, belku ew çend helbestên bi zimanê ermenî jî li xwe digire ku bi hostatî li kurdî hatine wergerandin, ên ku mirov bi xwendina wan tevî îftixarê hinekî jî didexise. Didexise; ji ber ku yek lê hay dibe ku dema ku neteweyekî dîtir lê nexebite ku li ser tunekirina hebûn/zimanê meriv hebe, kurdek çawa dikare bi çakî hunera helbestê bi zimanekî dî jî bike, bêyî ku neban bibe li helbestkariya xwe ya bi zimanê kurdî. Li gorî me, van temayên vê helbestsaziya xurt qîm di-

kir ku em wê li welatê wê, li we vegehrînin. Dîsa jî teqdîr û şirove dê ya we xwendevanan be.

Ji xêncî van xalan, bi nezera me gotî çend peyv li ser çawaniya amadekarî/tîpguhêziya me ya vê berhemê jî bèn kirin: Gava ku di peyvekê de herfên ji erebî (?) “ع” an jî “ع” hebûn û qinyata me ew bû ku dê bi hev dengên xwe yên bi dengdêrên kurdî bixelitîyana, me ew bi dabirê destnîşan kirin heke kêmnas bûna û bêyî dabirê nehatana ti wateyê; lê çaxê ku peyvên weke “hisret”, “hub”ê bûn, me bê dabir; “hisret”, “hub” an jî yên weke “çêv, te’v, me’r, te’rî, te’m, pe’rî, de’s” bûn, me ew wek “çav, tav, mar, tarî, tam, parî, das” û yên weke “ze’f, fe’m, be’r, rem, be’s” bûn jî, me weke “zehf, feh, behr, rehm, behs” veguhastin; ji ber ku hema bêje ne mimkin e ku bèn wateyeke din bi awayê vê pevguherîna me jî û çima ku di berhemên Elîxanê Memê yên bi alfebeya latînî de jî em rast nehatin li vê cudatiya ku di alfabeya kirîlî de hebû, ev yek bi me rew a û maqûl hat. Ji bilî van karakterên ji qirika erebî (?), wekî din ev herfa “ع” di alfabe û fonetîka erebî de jî di alfabe ya kurdî ya bi kirîlî de bi karaktereke din tê destnîşankirin, ku cuda ye ji “x”ya ku di alfabe ya me ya latînî de heye, peyvên bi vê karakterê gelekî kêmnas bûn, ji loma me ew bi “x”yê guherandin dîsa bi şertê ku wateya wan têk neçûya. Ji bilî van dengên, di alfabe ya kirîlî de “r”ya bi şid, “k”ya hilmî û “p”ya hilmî jî cihê dibin ji yên ku em di alfabe ya xwe ya latînî de bi kar tînin û ew bi dabirê tên destnîşankirin; herçî peyvên bi “r”ya şid bûn, berê me bi ihtîmala xelîfîna bi “r”ya normal ve kirin, lê di hinekên bi vî rengî de me teserîfa cotherfan kir; çî ku gelek xwendevan wê weke giraniyekê dibînin, lê tevî vê egerê jî me ew ji binî ve îhmal nekir, çî ku nasnameya peyvekê kêmnas û zêde dengê wê ye; lê wexta gotin hat ser karakterên hilmî, me zêde jî dilê xwe bi wan neşewitand, çî ku kêmnas û zêde ev arîşe di alfa-

beyên her zimanê de dixuyin, lewranê ew bi “k” û “p” yên me yên normal hatine veguhastin.

Herweha li serê çend peyvan, me ji xeynê cudahiya dengan, ji bo kurtkirin û daqurtandina dengan jî dabir bi kar aniye ku ev yek xweseriyeke zimanê axaftinê ye; sermeseleyê îfadeya “çawa” di devokên Serhedan de gelek caran wekî “ça” tê bilêvkirin/kurtkirin, mimkin bû ev awayê kurt di devokên “welatê jêr” de nehata maneyekê, heger bi dabirê nehataya nîşandan ku kîteya wê ya dawîn hatiye daqurtandin. Axirî; di van rêbazên têkilhev de ku para pirtir a sedemên wê ji ber bêgaviya xwe dan fêmkirinê cexa me li ser “wate”yê bû, lew vê yekê kir ku em bi têbîniyan hevwatera hinek peyv/îfadeyan jî bi xwendevanan re par ve bikin, ên ku em bi ser hevwatera wan ve nebûn jî me hewl da wan şirove bikin. Heger ji têbîniyan hinek ne aidî amadekar, lê ji weşana ewil bin, me ew ji yên xwe vavêr kirine, yên mayî giş ên me ne. Tevî ku ne gengaz bû jî ku em xwe bigihînin hemû berhemên Elîxanê Memê, yên ku hûn ê li vir wan bixwînin, ku me ji wan helbest wergirtine, bala me li ser wê yekê bû ku piştî *Surra Hisretê* em ên mayî bi awayekî kronolojik rêz bikin. Heçî helbestên ku sernivîsên wan di nav kevaneka çarçik de hatine nîşandan; ew helbest in ku di çavkaniya ewil de bê sernav bûn, lê bi tenê di tabloya naverokê de xwedan sernav bûn, ji bo cudakirina wan ji yên din me ew xistine nava kevaneka çarçik.

Bêguman wekî hemû kiryarên mirovî, di vê xebata min de jî dê gelek qisûr û kêmasî xuya bibin, herçendî min qebûl e ku berpirsê sercem kêmasiyan ez bi xwe me û bi awayekî şexsî min keşfa poetîkaya Elîxanê Memê kir jî; heta ku ev keşfa

min a şexsî bi gewde bû gihîşt ber destên we, gelek camêr û canikên li gelek deverên welêt û li welatên dereke ked da, ji wextê xwe dan. Dema ku bi lêkolînekê re mirov rastî pişt-giriya xîretkêşên wiloreng ên ji neteweyê xwe tê, gelekî hes-tiyar dibe û feyzê werdigire ji xîreta wan. Ji lewma, bi min xweş e ku yek bi yek navê wan bînim û spasiya wan bikim.

Bera berê, dema ku min bi tenê “Surra Hisretê” veguhasti-bû, xwendekarê doktoraya kurdî yê li Unîwersîteya Çewlîgê mamosta Mehmet Yildirimçakar, berhem serdanpê xwend û edîtoriyêke rind lê kir, di warê tîpguhestîneke hîn çaktir de jî, bi pêşniyar û rêbazên xwe rêya min xweştir kir, ji lewma spasiyên xwe ewilî li cenabê wî dikim. Piştî ku vê fikra min geşe bi xwe da û hêdî hêdî me amadekariya weşandina vê berhemê kir, ji bo min bigîhînin kes û karên Elîxanê Memê, stranbêja me ya hêja Aslîka Qadir û kedkarê xubarî yê rojna-meya *Riya Teze*, rojnameger Tîtalê Keremê Seyad, ked da; ji ber vê yekê spasiya her du keddayiyan dikim. Ji têkilîdanîna bi malbata wî û bi şûn de kurê wî rêzdar Naîrî Mûsoyan, bawerî bi me anî û dilniya bû û bi dilxweşî destûra veçap-kirina berhemên bavê xwe da me, çima ku baweriya xwe bi me anî û bi xweşkahlî destûr da me;; spasiya cenabê wî di-kim. Îcar qasideke jêhatî Seyrana Celada helbestkar-wergêr, di navbera me û rêzdar Mûsoyan de gelekî rênc da, wergerî kir, em li hev banandin, peyamên me gihandin hevdu bi dilxweşî; lew spasiya wê hêjayê jî dikim. Ji bilî navboriyan, hevalê min ê ku çend sal in min ji bo xebatê han dide Yehya Omeriyê helbestkar, xwe li edîtoriya vê berhemê jî bi hûrbînî û bi eşq kir xwedî –tevî gelek karên xwe mayî– û hayê min jê çêkir ku çend kitêbên perwerdehiyê yên Elîxanê Memê, li cem hevalekî me yê hevpar Tofan Sunbul in, Tofanê hêja yek nekir dudu û helbestên ku di wan kitêban de hebûn bi min re par ve kirin, spasiya van her du hevalên xwe dikim.

Herweha dema ku hayê min jê çêbû ku rojnameger-lêkoler Îbrahîm Bulak çend helbestên Elîxanê Memê berî min vegu-hastiye û di blog-sîteya xwe de belav kiriye, me doz jê kir ku destûrê bide min da ku ew helbest jî li vê xebata me zêde bi-bin, camêr pê razî bû û destûr da me, ji ber hindê spasiya wî jî dikim. Weşangerê ciwan Înan Eroglu, bi dildostî helbestên Elîxanê Memê hebandin û razî nebû ku ez wan negihînim we û tevî Yehya, hem xwe li min ragirt û hem jî li amade-kariyê sor kirim, spasiya wî dikim û ji weşanxaneya wî re serkeftinê dixwazim.

Ji bilî navboriyan, birrek mirovên din jî li cem min bûn di vê pêvajoyê de ku herweha wan tevkariyeke neyekser li vê xebatê û gelek kar û barên min ên din kiriye: Hevala hêja Esrakê û Guler Kayaya ezîz, ya ku di maweya çar salên min ên xwendekariyê de bûrs da min, ew derfet li ber min vekir ku bi rehetî bikarim vê xebatê û xwendina xwe bi serî bikim, keda wan nejbîr e, spasiya her du canikan dikim. Wekî din, hevmalên min ên xwendekariyê; Şêxmûs, Îlhan, Ersîn, civat û mamostayên min ên beşê kurdî yê Unîwersîteya Çewlîgê, hûn ê tim di bîra min de bin, zehf ji we razî me. Herî dawîn; malbata min a ku ez gihandim heta îro û Gulşena xweşdivî, ya ku bi zêdebûna li malbata min, dê rîska jiyîna tevî tiralekî bin dara gwîzê jî bide ber çavên xwe, spasiya we jî dikim, her hebin...

Ferec Koyistanî

Hezîran 2023, Çewlîg

*“Îsal pehîze hezar awazî
Dibên bû* gunehê kurdekî hatiye
Ser şerîta xwe şeveke sahî
Ewê laçkê xwe şuştî û raxistiye.
Bayê ji dizî ve qetandiye, biriye
Û seranser deştê raxistiye.
Îsal peyîze hezar awazî
Dibên bi qesta kurdekî hatiye...”†*

* **bû**: bo, ji bo, seba û wd.

† Li gorî hevpeyvîna “Evîndarê Kurdistan û Ermenistanê; Elîxanê Memê” ku sala 2012yê bi Elîxanê Memê re hatiye kirin; ev helbesta wî ya ewil e ku hîn dema ku 12-13 salî bûye li qelemê xistiye. Digel ku di heman hevpeyvînê de diyar dîke ku ev helbest bi ermenî bûye jî, lê ji ber ku qîmetê wê yê manewî hingivî dilê me jî em wê raberî xwîneran dikin, bêyî ku dest di rastnivîsa wê ya bi kurdî werdin.

SURRA HISRETÊ

(1989)*

Şiêr û Poêm

**Edebiyata Bedewatiyê, Bahar-8*, hazir kirin: Karlênê Çaçani, Çerkezê Reş, Eskerê Boyîk, Weş. Xorhrdaîn Grox, Yêrêvan, 1989, r. 186-203.

Hatibûme Çiyê

Hatibûme çiyê,
wekî berev kim zargotina durr,
şev û ro gotin:
şivana gotin,
û pîra gotin,
û kala gotin –
ne serî hebû, ne binî...

Min ser qeytanê ew gişk nivîsîn...

Na, tenê me'nî zargotin nîn bû,
wextê ez hatim bin konê spî,
ne jî tu gunhê baranê bigir,
çavêd te boy min beyt û çîrok bûn,
meşa te – reqas,
dengê te – kilam,
birûyê te ye kaw – têderxistinok...

Bin barana gurr, ya ku lê dixist
defa çadirê bi tiliyê nazik,
me sêwirand huba xwe ye durr,
mîna serhatiya Memê û Zînê,
Leylê û Mecnûn,
Xecê û Siyabend...

Û min nivîsî ser qeytana dil...

Her ro wê bêjin serhatiya me –
kaniyêd zengîn,
zinarêd zengîn,
barana nermik – bi lêvêd tenik...

Xelayî

(Ji Cimaetê)

Xelayê got:

– Ber min kes tab nake!*

Çêlekê kir mizîn:

– Lê ez çi me?

– Tê pê çi şer bikî?

– Pê girêşa[†] xwe!

Xelayê got:

– Ber min kes tab nake!

Zeviyê kir xuşîn:

– Lê ez çi me?

– Tê pê çi şer bikî?

– Pê similê xwe!

Xelayê got:

– Ber min kes tab nake!

Xebatçî kire gazî:

– Lê ez çi me?

– Tê pê çi şer bikî, hêsîr?

– Pê ruhê xwe,

Pê nan û şîr!..

* **tabkirin:** desthilanîn, deyxkirin, diberxwedan.

† **girêş:** guhan.

[Dijminê Xwe ra]

Dijminê xwe ra
tişteki navêjim,
maqûlî nîn e...
Lê ez çi bêjim
pêşvanê* han ra,
ê cimaet firot,
weten jî pê ra,
kerî-sûrî pez
kîrî û... bir dot...

* **pêşvan**: pêşeng, rêber, serkeş, serok.

Mêvanê Hertimî

Çaxê Ksênofon hat Kurdistanê –
nêçîrvanê me dihatin
ji nav mêşê six*,
xwelîbêcara† erd şov dikirin,
wekî genimê zêrîn biçînin –
bi destê rastê.

Çaxê Ksênofon hat Kurdistanê –
Xwedê Îsa neşandibû
ji jorê berjêr,
wekî meriv be nava meriva,
ne jî hela hê Mehmed pêxanber
dîn û ilmê xwe hev disiwirand,
çawa‡ hebandin-dîne herî zor.

Çaxê Ksênofon hat Kurdistanê –
Plûtarkosê firşteng§ jî
Ksênofon ra nedabû çêra
bona dilê sax,
bona dilê xêr,
bona dilê rehm...

* **six**: “tov” a dijawateya peyva “firk”ê, ne bi wateya a “bizr”. Ji “sık” a tirkî.

† **xwelîbêcar**: digel venêrina li çendîn ferhengan jî em bi ser maneyeke tekûz a vê peyvê ve nebûn: lê dimîne peyva “cotkar”.

‡ **çawa**: jorborî ne bi maneya wê “çawa”yê ye ku derbirîna pirsê ye, bi maneya derbirrînê mînanîne yê wekî “fena”, “mîna” “wek”ê ye.

§ **firşteng**: bêhteng, cirmexweş, hêrsok, xulqteng.

Çaxê Ksênofon hat Kurdistanê –
tavê şewq dida ser çiyayê kurda,
ku neketibûn bin nîrê dijmin,
bin destê xelqê
û Baba gurr-gurr dişixulîn nuh
çawa şamdanê azayê.

Bin îşiqa wana
nêçîrvanê me diçûn nêçîrê,
xwelîbêcara genim diçandin –
bi destê rastê,
şivanê me jî pez diçêrandin –
ber palê çiya...

Ksênofon timê tê Kurdistanê –
tê – bi dilê sax,
tê – bi dile rehm,
tê – bi dile xêr...
bira ser çava
û ser sera bê...

Kê ku Bêje

(Ji Cimaetê)

Kê ku beje: “huba te rindik nîn e”,
wê şûrekî yan xencerekê
dilê min xe.

Îşiq ketiye erd-ezmîn,
hinek divên:
– Sibe safî bû?
Lê ez divêm: – Çima navînin,
evîna min tê û diçirûse!

Şingîn ketiye erd û ezmana,
hinek divên:
– Leyî rabûye?
Lê ez divêm: – Çima hûn nabihên,
xirmîna morî-mircana ye!

Kê ku beje: “huba te çiqas rind e”,
wê ji dilê min ava sar vexwe.

[Xwedê Ruh Daye]

Xwedê ruh daye,
bin deynê Xwedê,
ez ê derkevim?

Dinê can daye,
bin deynê dinê
ez ê derkevim?

Wetan hub daye,
bin deynê wetîn,
ez ê derkevim?

'Emrê xwe dijîm –
deynê xwe didim, –
weke şîrê xwe...

[Par Wî Çaxî]

Par wî çaxî,
germa nîvro,
ez bûm mêvan wan çîmana,
min şara xwe boy te vekir
û ser te kir sî û çadir...

Niha dûr im,
tu jî pala çiya-çadira da
niha lasa* rêz dikî,
kêlendiya xwe tim tûj xwey ke,
ku neyêşin gul û gîha.
nevî-nevî tu xirav kî
wê hêlûnê,
ku dilê min
par wî çaxî wir da danî.
Wê bifirin kewêd bîrê,
wê bifirin kewêd bîrê
ji çayîra cahiltiyê...

* **las**: komikên gihayê ku tê çînin/dirûtin; gava çend heb tèn ser hev, "lod"ekê pêk tînin.

Kilama Sor

Ez ê pirs kim: – Qîzik,

kîjan rengî hiz dikî?

hergê* cabê bide:

– Ê sor!

Ez ê bixemilînim

sîng û berê qîzê

bi gul-sosinêd sor.

Ez ê pirs kim: – Qîzik,

kîjan rengî hiz dikî?

Hergê cabê bide:

– Ê sor!

Ez ê wergirim

bejn û balêd qîzê

bi kincê sor.

Ez ê pirs kim: – Qîzik,

kîjan rengî hiz dikî?

hergê cabê bide:

– Ê sor!

Ez ê zîn kim hespê kumeyt,

wekî birevînim

ber bi padşatiya sor,

ku berbanga tèn û... naçin.

* **hergê**: eger, herge, şayet.

Klêopatira

Klêopatira, Klêopatira,
rastî te hatim
ne ku wê berriya Saharê da,
lê orta çiyayê bilind e* hikiyat,
rêza kîjana[†] dikişê şev û ro,
mînanî çemê Nêxosê[‡],
ber bi ezmana,
heta hetayê.

Û te ez birim bi dergê teng ra
koçk-sarayê xwe yê bûzxane,
ku surr-zivistan
dikutan derî û kulek,
dianîn serma, mij û dûman.

Klêopatira, xanima berfîn,
Klêopatira, horiya berfîn,
ser girkê milê te dimilmilî
xêlîke qerqaş – berfa yekşevî
û kuliye hevê[§] danîbûn nazik
ser bisk-birûyê te.

* “-e”ya jorborî ne bi maneya gireya kesandinê ya kesê sêyem e; gireya mêza ya veqetandeka diyar e ku di rêzimana kurmançî de bi awayê “a/ya” heye. Di hin devokên Serhedan de ev pevguherîna dengan ron û zindî ye.

† **kîjan**: awayê bikaranîna wê “kîjan”ê, ne bi awayê wê “kîjan”ê ye ku îro roj di rêzimana kurmançî de bi pirranî wekî cînavka pirsiyarê tê zanîn; jorborî bi rola “-ku”yê rabûye çaxê ku digel gireyeke veqetandekê cînavka girêkî pêk tîne. wate; “kîjana dikişê şev û ro”, îroj bi awayê “a ku dikişê şev û ro” tê zanîn û bikaranîn. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmançî*, (çapa sêyemîn), Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2015, r. 153-154.

‡ **Nêxos**: navê Çemê Nîlê yê bi ermenî.

§ **hev**: heb, tene.

Bilindayî bû textê te yî sar,
ser kîjanê min hişyar dît
xewneke qerqaş
û ramûsana berfîn jît* ...

Klêopatra, Klêopatra,
tu têy bîra min her sal, wî wextî,
ku berfa surrê dibare hûrik,
ramûsana sar
û xewna berfîn tu min ra tînî,
ku qalçîçekê evînê
rabine ji xewê,
bin bûza qurnê.

Klêopatra, Klêopatra,
zivistana min, havîna çûyî...

* Ji lêkera "jîtin"ê ya radera wê bi pirranî wekî "jîyîn" tê zanîn.

Hub û Dua

Qewl dest pê dibe
ji kesera dil,
lê xilaz dibe
şaya çava da

Dua qise ye tevî xwe,
tevî ruhê xwe.

Hub dest pê dibe
ji şaya çava
lê xilaz dibe
nav kesera dil.

Hub jî qise ye tevî te,
tevî ruhê te.

‘Emir qise ye
tevî xwe,
tevî te:
Ne dest pê dibe
û ne jî – xilaz.

[Min Hespê Xwe]

Min hespê xwe
çê m da dişûşt,
wextê qîzek rabû ji çê m,
gerdena xwe da ro-tavê.

Ji gerdenê hevkêd avê,
dibûn mircan
û diketine ber kulîlka...

Ez nêzîk bûm,
ewê xwe kir perrê kewa,
firî û çû:
bûk birine erş-ezman...

Hespê min î paqij î kaw
min serê rê-dirba dixê,
lê navînim heta îro
evîna xwe, ya ku derket
ji elkanê* çemê we'de†
Û mina bû‡, û mina bû...

* **elkan**: bixwîne weke "êlkan" jî, "pêl".

† **we'de**: dem, wext, zeman.

‡ **minabûn**: berzebûn, windabûn.

[Orta Me da]

Orta me da – çemek...

Ez li vî berî,

tu li wî berî...

Çem dikişe, dikişe şev û ro,

lê zelal nake

orta min û te.

Orta me da – gelîk...

Ez li vî banî,

tu li wî banî.

Gelî tije bûye bi derd û kula,

lê guman nabe pira

orta min – te da.

ez li vî alî,

tu li wî alî...

Ruhê Çiya

Rêz bi rêz – konêd erebî...

Qîzek digere usa* naz û nerm.

Ser pêçiyê linga...

Kon bi kon

û yek-yek çirê obê vêdixe –

ruhê wan çiya.

Tek-tenê ber bi konê min nayê,

ax, şeverêşê û tenêtiyê

bona min tîne, –

ruhê wan çiya.

Rêz bi rêz – konê erebî...

* **usa**: wisa, wiha.

[Dûr va]

Dûr va çirak xuya dike,
ji wê digirim,
diçim, diçim...

Bin çadirê
bûk bêşikê dihejîne...

Ax, diya min
zarotiya min dihejîne,
lê stêrka... xew jê dizîne.

Ballad Derheqa Konê Me

Kalikê min xwest malekê çêke
serê zeviyê,
binê zeviyê,
hîmê wî avît,
lê dijmin hilşand...

Ji mûyê nêrî kalikê min hûnand
konekî fire
û vegirt ber surr û sermê, qeziyayê...
lê dijmin pey hat, çawa tarîstan,
wextê roya dînc penc dikişand,
çawa kela zor –
konê me yî zor
bi xewnêd zara, bi xwestin-guman
ber şevereşa radibû,
heta berbanga xêr-xweşî dihat,
îşiqa xwe dida,
çawa sûr-sîleh îşiqa xwe dida –
kal-bavê min ra...

... Niha konê me qet-qet dirize
goşê malê da,
hîmê kîjanî dijmin hilşandiye.

Ka kê dizane yanê bîr tîne
wan qatê kon da çika çi hene?

Tarîxeke zor wira dirrize...

[Silav Da]

Silav da
îşîqa pêşin,
berfa paşin...

Xatirê xwe xwest
ji berfa pêşin,
ji îşîqa paşin...

Usa derbaz bû
orta îşîq-berfê
havîna hubê.

[Ez Bêy Te]

Ez bêy te nimiz im, –
çawa gelî,
tevî te bilind, –
çawa hêsû.

Ez bêy te kê m im, –
weke dilek,
tevî te zêde, –
weke dilek...

Çawa Peyayî Ser Erdê Bûm

Yek im, ez yek im.
rast e çira me,
husilcema^{*} im,
lê zehf qure me, ne eyan,
tenê, nenaskirî.

Ez divêm,
ez dibihê, m,
yek – yek e...

Hergê dixwezin peya bim
û bêm ser erdê,
min ra bişînin ya duda,
dua – durozge kêrî kê tèn.
min ra bişînin ya duda:

Ez bêjim,
ew bibihê.
ew bêje,
ez bibihê.

Û ji şabûnê
gema heşpa xwe ez berdim.
û ewra şov kim,
birq-birûskê ra bilîzim.

* **husilcema**: rûyê bedew an jî bedewiya rû, herweha bixwîne “husn-î cema” jî.

Yek – yek e
dudu – hizkirin...

Ji ramûsana orta min û wê
bira bibişkive ê sisêyayî
tîfalî nazik,
wekî bipirse:
– Bona çi ye erd?
– Bona çi ye evd?

Hevtekê da ez ê însan bim
ji jorê – jêrê,
her tişt, ku Xwedê sêwirandibû

Nava hevtêkê,
lê ez dêmê xwe naguhêzim,
çawa Xwedê kir, ku jêr nas nekir,

Ne jî kurê xwe ez ê verê kim
jor da ber bi jêr,
çimkî Xwedê şaşî kir,
ku kur tenê şand,
Xwe xwe ma jorê –
tenê, tek-tenê...

Yek – yek e,
dudu – hizkirin,
sisê – ocax e...

Lê ez natirsim
ji çara, pênca û şeşa,
colang* dihejin
orta erd-erşa.
Xwedêti usa sist dibe,
lê qewîn dibe merivatî.
... Colang dihejin
orta erd-erşa.

Yek – yek e,
dudu – hizkirin,
sisê – ocax e,
çar – komek e,
pênc – tifaq e,
lê şeş – qewat e...

Hîviya min bin,
ez ê lehdê† bêm bona ê hevta,
seva kîjanî erd kûr e,
ezman jî dûr e,
lê dihebîne,
lê bawer dike,
û temiz maye ji der û hundur.

Ez ê peyayî ser erdê bim,
ez ê bigerim ser erdê,
wekî ew ji jêr – ber bi jor nayê.
min zû va dijimart kul û hêsirê wî,

* colang: 1. dergûş, landik. 2. cureyekî rîsê.

† lehd: yekşem.

Xwedê... şa dibû...
Ez ê hêsa bim bi hebandinê,
bi bawerbûnê, bi paqijîya wî,

Usa hêsa bim,
wekî hişyar bim
tevî hevtiya tê,
tevî berbanga hevtiya teze
nikarim yekcar
yekitî – xwedêtî,
yekitî – tenêtî,
yekitî – netîştî...

Yek – yek e,
dudu – hizkirin,
sisê – ocax e,
çar – komek e,
pênc – tifaq e,
şeş – qewat e,
lê hevt... hevt – êl e,
maka meriv e.

... Îdî hatime, îdî vira me;
ser erdê,
ez kurê erdê
û heqîqetiyê.

[Hergê Xwey ke]

Hergê xwey ke
mixek nalekê,
Nal jî – hespekê,
hesp – mêrxasekî,
mêrxas – malekê,
mal jî – gundekî,
gund – cimaetekê,
welat wê çêbe!
Welat ku çêbû,
mixekî bikine
hîmê wê malê,
sercêmîkê* va
nalê dar da kin,
stûyê hespê va
temeziya sor
timê girêdin,
şûr-qema dayînin,
pencara vekin
ber bi qulbê
topa dinyayê.

* **sercêmîkê**: bera berê, beriya beringê, serê pêşî.

Kurdek

Du kurd zor in,
kurdek timê
têrê nake,
ku Kurdistan
aza be.

Tifeq zor e,
kurdek zor e,
kurdek timê
têrê nake,
ku Kurdistan
aza be.

Ew kurdê kêr
dive k' ez im?
herim, tam kim,
ku Kurdistan
aza be!

[Çiya Spî Bû]

Çiya spî bû,
dayika min pê ra,
lê çiya dîsa
kesk û sor kir,
dayîk spî ma.

Berfa pîrbûnê
barî ser sêrî,
kesereke kûr,
hisreteke dûr
dil da qerimî...

Dinya Min

Pêşxeber

Dinê ya min bû
hê berî – berî bûyînê,
paşî mirinê
dinê wê dîsa ya min be.
Eva xewn nîn e –
îro ya min e, vir mala Xwedê,
ez jî yê wê me –
berî mirinê,
paşî bûyînê,
çimkî tê xanê, ku dewsa xwe da
usa jî maye, gilover maye,
ça* bava diye,
ça bava jiye...

Ez jî divînim weke çavê xwe,
qasî şîrê xwe,
weke eslê xwe,
wekî xan-manê dinya han:
hin çûne,
hin mane,
kê maye –
ew jî mêvan e...

* ça: çawa.

Wekî nêrdiwana dinya han:
hin jor in,
hin jêr in.
Wekî xezne ye dinya han:
yek têr e,
yek birçî.

Wekî dewî ye dinya han:
rûvî tê hene,
şêr jî tê hene...

Dinê her tişt e,
lê milkê bavê kesekî nîn e,
çerx e, dizivire –
hineka ra rast,
hineka ra çep,
lê çiqas diçe
hê mezin dibe,
dibe gilover...

Nizanim, jor im yan jêr im,
têr im yan birçî,
rûvî me yan şêr,
lê ez mêvan im dinê da:
sirya* min hatiye,
dora min hatiye,
ez ê nanê xwe bihêrim,
ez ê 'emrê xwe bihêrim
aşê we'de da...

* Ji "sira"ya tirkî. Bi kurdî: dor, rêz.

Para Yekê Yan Nama Pêşin

Min namek stend ji şikilkêşekî:

– Şayîr, dixwezim şiklê te
binitirînim,
lê dûr î,
lê dûr im
û nikarim bêrn,
tu îznê bide...

Min cab şand:

– Çavê min hene – dudu ne,
destê min hene – dudu ne,
guhê min hene – dudu ne,
lingê min hene – dudu ne...

Du dest bibin yek, –
dikarin çiya hilşînin,
du çav bibin yek, –
karin erd-ezmîn nêzîk kin,
du ling bibin yek, –
karin steyrka bigihînin hevdu,
du guh bibin yek, –
dikarin bibihên dilê erş-ezmîn,
surra erş-ezmîn...

Lingê min hev ra,
guhê min hev ra,
destê min hev ra,
çavê min hev ra,
timê dikevin hucatê,*
heta divînin û safî dikin
rastiya dinê...

Dêmek, dikarî şikil dest pê kî,
lê berî, berî destpêkirinê
niqitke xûn
û kulme' xwelî tev renga lev xe...
Ez ji xweliyê çêbûme,
him jî ji xûnê hatime hûnanê...
ruhdarkirinê, –
milyaket nîn im...

* **hucat**: herweha hucet, lec, pozberî, rikberî.

Rabûm, sekinîm,
ketim, sekinîm,
lingê rastê çû peyî ê çepê,
lingê çepê çû peyî ê rastê
û min pê avît
ser dar – şemîka topa dinyayê:
– Hatim, merivno!

Diya min go:
– Lingê te dûrî kevir-koçika!

Ji xwe nerevîm,
Min gava pêşin avît ber bi xwe,
paşê riya xwe dest pê kir

ji dil – ruhê dê, wekî bona min
rê vebin ber bi dilê meriva,
ruhê meriva
lê min nizanibû, ku riya dila
û riya ruha
teng e, çetin e.

De, dinê min ra gav neda,
hilbet dinê ra min gav da,
çimkî her du ling nasitirin,
heta qudûm ber çokê min heye –
hisreta rê ne,
ku behsa xêrê bivim benda ra,
agirê ocaxê bivim benda ra.

Ser riya 'emir gul ranexistibûn,
av – agira ra derbaz bûm,
ji şevereşa netirsiyam,
ne jî ji berfê, surrê û sermê
gav bi gav,
pê bi pê çûme ber bi ro-tavê...

Ling rê digerin,
ling rê vedikin,
riya xwe, hilbet, divînin
mînanî avê.

Û hezar derî ber min vebûn,
çimkî ez neçûm bi meşa werdekê,
neşûlikîm mîna marê reş,
min bêdef nelîst û nereqîsîm,
ne jî bin defa xelqê da
bê hemdî xwe ez reqîsîm,
her du linga xêr nivîsîn,
her du linga rê vekirin
bi nêteke qenc
û tevî erdê ketin misletê*, –
hûr û kûr...

Ku da jî diçin, – wira malekê
xwe ra çêdikim, –
ku kêrî min bê,
ku da jî diçin, –
ez navekî qenc xwe ra dihêlim,
ku da jî diçin... helal im,
heramiyê xwe ra hîlnadim

* mislet: civîn.

û nagerînim tevî xwe
dora dinyayê.

Ez rêça xwe ser topa dinê
rast-rast dihêlim
û bi rastiye dihêlim,
wekî peyhatî nexalifin.

Û ling hilnadim ji miskenê xwe,
ne jî dihêlim dijmin pêpes ke
deşt û zozana,
eger hucûm ke,
ez ê usa kim,
ku du linga jî hilde, bireve,
eger topal im...

Diçim, şer bikim, ne ku birevim,
wekî rê ji rê neqetin,
silçilet ha bèn
û ha jî herin.

Wextê dibihêm kilama zara –
ling erdê nagirin,
wextê divînim hêsirê zara –
xwelî direve ji bin lingê min.

Bira zar bigirin poça bayê har,
poça şiverê,
wekî birevin pey pirpirka,
kulîlka top kin,
steyrka top kin
û bi steyrka,

û bi kulîlka
sîng û berê xwe geş – nexş kin.

Lingê min mîna gayê cota ne
û ji vana yek xofê nakişîne,
ku cot tek-tenê dikişîne...
Tifaq in hev ra,
hev ra rê diçin,
vedigerin hev ra...
Lingê xwe weke bera xwe diavêm.

Şikirbûna xwe didim lingê xwe,
çimkî min divin ber bi ro-tavê,
şuxul-emela,
ber bi ocaxêd kal-bava,
ne ku dikevin telika şevê,
ya nerastiyê.
qelpiyê,
tariyê...
Çimkî nanihêrin li erş û ezmîn,
erdê dinihêrin,
wî erdî, kîjan hiz dike
nêzîkaya linga,
hevaltiya linga,
giraniya linga...

Mîna rêwîkî ez ê jî herim,
rêç ê bimîne,
çimkî du dergê vê dinê hene:
Rojê yekî ra hatime,
ê din ra ez ê herim rojekê...

Vê dinyayê da du tişt dimînin:
qencî, xiravî...
Ez pey xwe
qencyê dihêlim,
yanê xiraviyê?
Her Xwedê zane...

Dest dest dişo,
Her du dest –
ser çava dişon:
– Ya serê sibê!
Her du destê min
nan-xwê hiltînin:
– Rebê alemê!

Usa, her sibe
destê xwe diavê m eteka dinê,
destê xwe diavê m şuxul-emela:
çakûç hiltînim,
maça cot digirim,
yanê jî dasê,
wekî çavê min
li desta nîn be,
li destê xelqê.

Perr-baskê teyra diwestin,
yê min na, çimkî destê min
rast emel dikin, helal jî dixwun.

Hebûn-tunebûnê
sivik û giran dikin destê min,
tarî û îşiqê didin-distînin,
hildidin –
datînin
qencî-xiraviyê...
Wextê kesirîn,
bi keda helal,
ji keda helal
piştê rast dikim,
dest jî datînim tek ser dilê xwe,
yanê ser çoka,
lê ne ku ser zikê yekî birçî,
ser zikê xelqê.

Her ber mirinê
destê min ber min da têne xarê,
lê wextê dibihêm dengê zarekê
vedibin bona hemêzê.

Destê rastê – kur,
destê çepê – qîz...
Bi her du desta
ez hemêz dikim ewleda,
bê bask difirim ber pêşa ezmîn,
ber bi heta-hetê.

Lê wextê dijmin tê, diavê ser me,
bidin xatirê Xwedê û mêra,
destekî çakûç hiltînim,
bi yê din – tîrê,
ku him bixebitim,

him şer kim,
ne ku destê xwe tawer kim,
wekî zincîr kin û qeyd kin...

Tiliyê destê her kesî
beranber nîn in,
kîjan jî jê be,
êş ê bide dil,
çawa birêd qenc, birêd tifaqdar
tiliyê min mîna mûmê dişuxulin –
ser riya weten.

Bona xiraviyê destê min kin in:
Hêlûnê teyra ew xirav nakin,
ne jî mal û hal,
çêdikin pira xiyala
û nîşan dikin rê-dirba,
berbanga çiya:
Bi îşîqa tavê ser-çava dişom.

Dêst da sivik im bona çandinê,
bona dirûnê û pehtina nên,
ku destê min e helal û zelal,
nebin sêfîl bin destê xelqê.
Desta giran im bona xiraviyê.

Her gav û her dem dosta digirim,
ku destê min e dirêj kin nebin,
dest ê hev bigirin,
bibin qam-qanat,
hildin beyraqê,
bikevin meşqê

bona azayê,
bona 'edlayê,
her mertalê Şems ser milê min be...

Destê xwe
datînim usa ser sîng-dilê xwe,
ahd-qîrar dikim,
sûnda qenc dixwum,
– Destê min tu car xiraviyê nakin...

Mîna pênc tiliya dizanim:
Qencî bihar e,
gulê wê-dest in...

Usa, her sibe
destê xwe diavêm eteka dinê,
destê xwe diavêm şuxul-emela.

Kengê bû, wextê çavê min vebûn,
dinê beşirîn mîna steyrka
û firîn, firîn
ber bi perrê ezmîn mîna du teyra...

Her kesek dinê
qasî dilê xwe,
qasî şîrê xwe,
qasî ruhê xwe dibîne.

Çav hene girtî,

çav hene nepak, qelp û neşûştî...
bi çavekî xweş,
bi çavekî pak dinê dibînim.

Bona min dinê guleke sor e,
şev ro bîn dikim,
lê çav têr nabin,
birçî ne her tim... ji sivra dinê.

Çima diltêr im,
çavbirçî?

Kengê bû, wekî çavê min
reş başqe kirin ji rengê spî,
heta îro mane vekirî,
bûne eyna ruh,
bûne eyna dil,
bûne pencera –
ji ku nikarim birevim derva,
ji xwe birevim,
bi xwe birevim...

Û heta îro pare ve dikim,
dibînim xwe ra
rastî-nerastiyê,
qencî-xiraviyê,
tişt û netişt,
tarî-ronkayê...

Erê, çavê min birçî ne,
lê têr in tenê ji wana,
çi ku divînin,

lê zik tam nake,
lê ruh tam nake,
lê dil tam nake...

Ji rehma Xwedê razî me,
heyf, ez divînîm, her car divînîm,
wekî ser dinê hinek birçî ne
û dişewişin vir da û wê da,
hinek bêcî ne
û ditevizin bin perrê ezmîn,
hinek xiznê da vedigevizin...

Çima çavtêr im,
dilbirçî?

Hêsira narêjim, tînim ber çava:
– Dinê ha hatiye,
ha jî wê here...

Topa dinyayê hê dewsa xwe ye:
Ber tavê çûk e,
lê ber çavê min – mezin.
û dinya ronik
dîsa ser zar e,
ser avê,
ser nan e,
ser xeta cot e...

Çima carcara
ber çavê min dinê çûk dibe,
ber tavê – mezin?
Çiqasî rast e mêzîna çava?

Ew nexapîne.
Çavê min têne girtinê
ji berfa sibê,
serma êvarê,
behra bêgemî,
xortê divê: ez,
merivê dem-demî,
merivê bêqîrar,
rêwiyê bêheval,
xasiya kut-kuto,
bûka ewt-ewto,
dilê xem tê da,
zeviya bêav,
mala şer tê da,
êla bêserî,
kela du derî...
Eyd nîn in ew, strî ne bêjî,
dîl – ruh qul dîkin,
kul didin,
lê ku dibînin berbanga çiya,
yanê êvarê,
dudê evîndar... lezeta dinê!
Usa jî şa dibim, wekî dixwezim
ronaya çava bidim hemûşka,
çimkî dîtina, dîtina çava
rehetiya dila,
qinyata dila...
Çavê xwe dişom pê nûra sibê.

Ji ber çavê min unda bû rokê
sînorê weten,
ji çava dûr bûn,

lê dîsa nêzîk man, bûn ziyaret,
çiqas jî we'de dixwest
pê perda ewra,
piş perda ewra veşêre.
Reş bûn xewnêd min,
niha xûn digirîm,
ava reş tê ji çavê min,
gelo rok ê bê, ku bi çavê xwe
çavê te, weten, bibînim
û kûr ramûsim, bi nûr ramûsim,
ronaya çava ez paş da bînim...

Him çavbirçî me,
him jî dilbirçî.

Çavê xwe dişom pê nûra sibê
û derman dikim pê nûra sibê...

Dibihêm, ez dibihêm bi her du guha
dilê dinyayê,
ku teqil-teqil lê dixê,
ez dibihêm surra erş û ezmana,
vebûna gula,
taviya baranê...
Usa dibihêm – şev û ro,
rehetiyê tînin... guha ra.

Tenê guh nadim derewa
dijminê min e heq in ew,

ne ku guhekî, ez ê her du guhê xwe
jê kim, biavêjim ber seyê avî,
eger guhê xwe hînî derewa kim.

Derew dijminê Xwedê ne.

Ji virr-derewa
guh giran dibin,
dibin şikevta bayê wizwizok...

Guhekî ra tèn, yê din ra dertên.

Hergê guh bidim derewa
ez ê mala xwe xirav kim,
ruhê xwe ez ê talan kim,
dilê xwe ez ê tije derd-kul kim,
Xwedê êciz kim,
dijmin jî – şa kim.

Tên vî guhî ra, yê din ra diçin...

Derew gelek in, lê ne ku rastî,
na, nabe guhê ga da ez razê,
ber kîsikê virra şer dikim
bi giliyê kal û bava,
û giliyê kal û bava,
ez dikim guhar, guha va dikim
çawa nîgara mêranyê,
ne ku moriya xewa hingorê.

Her ro serê xwe rehet datînim
ser balgiyê erdê
û dibihêm dilê dinyayê,
ku teqil-teqil lê dixê,
dibihêm, ça nêzîk dibe 'edlayî,
dibihêm, ça nêzîk dibe azayî...

Para Duda yan Nama Duda

Çawa divînin, birê şikilkêş,
çavê min hene – dudu ne,
lingê min hene – dudu ne,
guhê min hene – dudu ne,
destê min hene – dudu ne,
lê serî yek e,
lê ezman yek e,
dil yek e...

Eger navînim qencyê –
çavekî karî tu derxî,
eger xiraviyê bikin –
karî destekî tu ber da jê kî,
eger bibihêm derewa –
karî guhekî bibirî,
eger yan herim –
karî lingekî bişikênî,
lê ziman yek e,
dil yek e,
usa jî serî.

Dil nabe dudu,
ziman jî – dudu,
serî jî – dudu,
çimkî nikarin
gilîkî bêjin – him rast, him derew,
nîvro ra bêjin – him şev, him jî ro,
û mast ra bêjin – him reş, him spî...
naxwezim bibim merivê dudilî,
merivê duserî,
merivê duziman...

Serî, dil, ziman yek in – çira ne:
rast ra rast divên,
xar ra xar,
şevê ra şev divên,
royê ra ro,
reş ra reş divên,
spî ra spî...
Rastî jî yek e,
dinê jî yek e, –
her yek çirak e!

Çav çi dît,
dil go: – yê min e.

Guh çi ku bihîst,
dil go: – yê min e.

Ling ku ket,
dil go: – yê min e.

Dest ku çû,
dil go: – yê min e.

Ê dilê min in her tişt û mişt:
erş û ezmana,
topa dinyayê,
mûrî û padşa...

Dil dewlemend e!
Dil dewlemend e!
Dil dewlemend e!

Dil çi bizanibe, saxê dilê xwe,
wekî hene tişt,
ji kîjana dil tê da dimîne,
tam nake,
têr nabe...

Lê dîsa, dîsa ser dinê germ e,
Her car ber bi dilê dinê dil diçe,
eger gulle tê berdanê,
bombek diteqe,
şipûk* digihîje,
lê ber dilê min dinê qey nayê,
hê ser da we'de tê-diçe,
ne tê, ne diçe,
xwe ra dilîze
tevî dilê min:
Xem diavê hundur, –
reş dike,
derziyê lê dixê, –
birîndar dike...

Xema dinê ye, xema we'dê ye,
wekî dilê min
şûşe ye, şikest –
ew nacebire,
gul ku qurçimî,
îdî bîn nade...

Ber çavê dinê-alemê
dil kînekîn e,
dil zarezar e ji jana we'de,
dil bûye xuşûş,
dil bûye kevir,
xof ketiyê hundur,
xem ketiyê hundur...

* şipûk: sûlav.

Guhtêr im,
desttêr im,
çavtêr im,
dilbirçî...

Ketiye halê dinê, dinale,
lê dilê min ê çivîka nîn e,
mezin e, behr e, temiz e...

We'de nikare
pê baltê xwe ew bişikêne
û bişewitîne pê agirê xwe,
çimkî pola ye.

Li nav vî halî,
ax, dilê min tê ber dilê
her kesî:
ber dilê giran,
ber dilê sêwî,
ber dilê sofî...
bi dil vedikim
kilîta dilê her kesî,
bi dil ji dila derdixim
kul û derd,
reş û heş,
dewsê dil didim,
bi reza, reza dilê xwe
xem tije dikim,
bi dil-eşq,
bi dil-can,
bi dil-cehd gumanê didim,
agir gurr dikim...

Dil-hinavê min ker bi ker kirin,
lê dil pola ye,
çimkî dinê ra îsaf lazim e,
xemxurî, qencî...
Dil didim ber xwe,
dil didime xwe,
çimkî dilê min dimîne tenê
ber derd-kulê xwe,
mîna teyrekî perrşikestî...

Dil didim ber xwe,
dil didime xwe,
eger dixwezin qutiyê vekin,
ez kilîta dil didime we,
rê jî fire ye,
herin, lê ew rê
tek dil dikarin bivînin,
bi dil dikarin bivînin,
misurman be, hind yanê xaçparêz,
çimkî dilê min dîn-nehebîn e,
ez dilekî na,
hevtê du dilî
hubê dihebînim,
surrê dihebînim.

Dil dewlemend e
û dewlemend e êşa dilê min,
kula dilê min,
derdê dilê min,
lê dil ser dinê germ e û...
tije hub...

Ziman dane min, wekî xeber dim,
ne ku bayê sar daqurtînim
û bikim bager,
û bikim dûman.

Rabim, tişteki ez bêjim,
rûnê, ez bêjim tişteki dinê,
berê dipêjim,
paşê dirêjim.

Nava sî û sê dirana
sewta, xebra dipêjim,
giliya ez tînim ser zimanê xwe,
wan sewta
û wan giliya dikim, dipêjim
nav kûra ruh û dilê xwe,
paşê ez wana diavê bi hubê
nava sî û sê zimana,
ruh dişewitînim bi agirê ruh,
dil dişewitînim bi agirê dil
û ez distirê bi hezar lewzî,
ziman divînim
ez her kesî ra,
tevî çar qulbê dinyayê.

Zar-zimanê min
nazik e, çawa kaniya çiya,
gulêd geliya,
bilbilê baxça,
gilî pey geliya,

gilî ser giliya dirêjin.

Lê wexta heye
dibêjin – yek e,
nabêjin – yek e.
merivê çê-neçê
tên û ber devê min disekinin,
ça gurê devxûn,
xûna reş dikin devê xwe,
pirrî min dikin,
ruhê xwe vir da-wê da dihejinin,
vedikin derê kîsikê derewa
û gewra dikin...

Ziman nagere,
ziman nazivire,
devê xwe tenê dibim û tînim,
çimkî divêjin –
xirab dertêyî,
navêjin xirab dertêyî,
xeber kê-m-zêde, bêxwê, daqlenos*
vik-vala bêtam û netê dibin,
nagihêjin guha,
guha da neçin...

Parîkî heram nakim devê xwe,
ne jî divêjim gilîkî heram,
tama devê xwe ez zanim...

* **daqlenos**: digel ne piştrastbûnê jî, texmîna me ew e ku awayekî din ê derbirrîna peyva “deqnanoz”ê be ku hem tê maneya peyvên weke “efsane/mîtê” û hem jî tê maneya yên weke “entîke/kevnîk”ê.

Ro diçe –
wext pê ra,
nan ra dibên dê,
avê ra – bavo,
çimkî xelayî kare çok vede
ber derê hemû-hemûya.

Du lêv in,
dev wexta divê,
lêvê min pê ra dibêjin,
gilî pey giliya,
gilî ser giliya şax diavêjin,
xeber jî dibin kevirê kewkaniya,
gilî-gotin zêr dibirrin...

De, hergê linga
tu dişimitî,
karî xwe bigirî,
û hergê ziman
tu bişimitî, –
nikarî
xwe bigirî...
Lema jî divên:
– Şîrin e ziman,
tal e jî ziman,
dijmin ziman e,
dost jî ziman e...

Ziman dibirre weke şûr,
ziman qul dike weke tîr,
lê bêhestû ye,
ne bêhestû ye,

lema jî divên;
birînê şûr û tîra qenc dibin,
ya zimên nayê bîrkinê,
dermankirinê...

Zar-zimanê min zengilê dêran e,
gilî û gotin –
bahara dila...

Du lêv in,
dev wekî divê,
lêvê min pê ra divêjin,
gilî pey giliya,
gilî ser giliya diavêjin
nav dilê evda,
nav dilê benda...
Di-pê-jin!

Serê giliya ez ê ha vekim,
ku dinya me da
rastî me tên her cûre serî:
serê bêaqil,
serê dîn û har,
serê bêserî...

Lê ez ê îro bêjim bona wan,
kîjan serî ne bi her aliya va:
ji der,
ji hundur,
ê ku dikevin nava hucetê
tevî dewletê.

Dewlet divê: – ez,
serî divê: – ez...
Aqilê serî
xwe genim nîn e, wekî çap bikî,
ne jî penêr e, wekî ker bikî,
gerekê nas kî weke fehme xwe,
wekî ji serê xwe der şuxul negirî
û wî navêjî
nav gêjgerîngê, mij û dûmanê,
qeda-belayê,
ku rokê
tu pariyê xwe ra serê xwe nexwî.

Gere aqilê xwe sêrî da xwey kî,
wekî nehêlî hiş-aqil badin,
bistînin,
rût bikin mîna darê payîzê,
gere tu xweyê aqilê xwe bî,
wekî bigihîjî giliya, miraza,
nêt û merema,
ne ku mehrûmê û belengazê
aqilê xwe bî...

Dinê dipirsim û dişêwirim,
bi aqilê xwe rê diçim,
wekî lingê xwe navê m nav êgir.

Aqil dikare çiya hilşîne,
çiya nikare aqil hilşîne
yan welgerîne...
Dinya bi aqil tek ava dibe.

Dewlet divê: – ez,
serî divê: ez...
Lê dewlet çiqas qewet û zor be
dîsa xwe diavê aqil-kemalê...

Bê xwelî, cimaet nabe dîwan,
bê aqil nabe him dîwan,
him qewet,
him dewlet...

Aqil tacek e,
ne serê hemû kesî ye.

Nexş-rewşê serî ne guh in,
ne por,
ne dev-lêv,
ne poz-birû,
aqil – kemal e,
ya ku, ça divên, sala da nîn e,
ne bedewiyê da,
ne jî qalib da...

Serê bêaqil zinar in,
serê dîn-hara kundir in,
serê vik-vala hesin in,
serê bêserî, de, bêserî ne...
Aqil tacek e,
ne serê hemû kesî ye.

Eyna min timê vekirî ye,
serê min – bilind,
çimkî dikeve hucatê
tevî dewletê,
dewlet divê: – ez,
serî divê: – ez...
Serê giliya ez ê ha bigirim.

Paşxeber Yanê Caba Şikilkêş

Çavê te hene – dudu ne,
destê te hene – dudu ne,
lingê te hene – dudu ne,
guhê te hene – dudu ne,
lê serî yek e,
lê ziman yek e,
dil yek e.

Lingê te hev ra,
destê te hev ra,
guhê te hev ra,
çavê te hev ra,
timê dikevin hucatê
heta divînin û safî dikin
rastiya dinê
û didin dil ra,
didin serî ra,
didin ziman ra...

Dil nabe dudu,
ziman jî – dudu,
serî – jî dudu,
çimkî nikarin
gilîkî ra bêjin him rast, him derew,
nîvro ra – him şev, him ro,
û mast ra – him reş, him spî...
naxwezî bibî merivê dudilî,
merivê duserî,
merivê duziman...

Dest, ling, ruh û çav hev ra tifaq in,
hev ra bira ne,
hev ra tim pişt in,
çawa serî, dil û ziman.

Tu îznê didî,
şikilê te bivim temaşgehê,
wekî dar da kim ji îşiqa tavê?

Filankes û Bêvankes

Tenêti

Şayîr tenê bû roja kutasiyê,
tenê, tek-tenê,
ku ji serê xwe Filankes derxist,
lê Bêvankes jî pey ra şimitî
ji ser zimanê şayîrê eyan,
wekî dagirin tenêtiya wî.
Û çaxê şayîr difikirî merd,
Filankes dihat ber disekinî,
tefekûrî, çawa aqilbend,
û hergê şayîr dixwest xeber de,
Bêvankes dihat ber disekinî,
çawa gilîgo,
lê şayîrê zor nedifikirî
roja kutasiyê,
ne jî dikaribû kilam bibihîsta, –
ji hal ketibû,
temirî bû ew, mîna kûrma* gurr...

* **kûrm**: agirgeh.

Weysetê Şayîr

Çaxê şayîr ber ruh da bû, go:

– Fikir namire...

Filankes stend heta-hetayê,

lê serîxwebûn unda kir.

– Gilî namire!

Bêvankes stend heta-hetayê,

lê serîxwebûn unda kir,

ku her kes çî çax bixweze

têke qîlxê xwe,

têke dilqê xwe,

bike Tu-ê xwe

bike Ew-ê xwe

hişê xwe bide,

zarê xwe bide,

û tevî wana bi zar û fikir

tenêtiyê alt ke,

êciziyê alt ke...

Vî Alî û Wî Alî Dinê

Vî alî dinê
her kes mijûl bû bi şuxulê xwe:
Şivan pez dibir zozana,
esker şer dikir,
cotkar radikir erdê xam,
aşvan jî genim dihêra...

Şayîr jî çûbû ber rehma Xwedê.

Usa Filankes û Bêvankes bûn
mêrxasêd şîerê wî ye lap paşin,
ku firîn û çûn wî alî dinê –
yek filan yêrê*,
yek bêvan yêrê,
ku agir avê vêdisîne,
ku çiya dikişin,
çem disekinin,
ku bêyî havên şîr dibe mast,
ku bê ewr baran dibare,
dewsa baranê steyrk dirijin...

* Ji "yer" a tirkî, bi kurdî: cih, der, dever, herêm, hindam.

Her yêrek
cema têrrekê,
û her yek –
devê şûrekî...
Û Filankesê bêvan tişt dikir,
lê Bêvankesê filan tişt dikir,
her yek cûrekî,
her du cûreyî rêkê da diçûn,
diçûn gundekî,
ber bi kûraya wî alî dinê.

Û kivş nedibûn,
ne eyan,
çimkî tu kesî nedianî bîra xwe,
nedianî ser zar
paşî mirina şayîrê eyan...

Vî alî dinê
dîsa şivan pez dibir zozana,
esker şer dikir,
cotkar radikir erdê xam,
aşvan jî genim dihêra...

Tariyê da

Usa Bêvankes, Filankes
bêvan yêrê da,
filan yêrê da
bi her du linga ava reş da çûn,
çimkî ne didan,
ne jî distandin,
ne xof dikişandin,
ne jî ditirsiyan,
ne digiriyan,
ne jî dikeniyan,
çimkî ne tî bûn,
ne birçî,
ne yê şînê bûn,
ne yê şayê bûn,
ne îz* bûn, ne toz,
ne diçûn, ne jî dihatin,
ne yê defê bûn,
ne jî yê refa,
ne xewna şevê,
ne nêta dil bûn...

Ba derê wana vedikir,
ba derê wana digirt,
çimkî ne xwe ra,
ne jî xelkê ra pak bûn.

* îz: ji tirkî. bi kurdî: "şop", "rêç".

Tevî Xwe

Zareke milûk alîkî avît
xişmişkêd xwe:
– Niha jî ez ê bilîzim
tevî xwe...
Lê dê da kur kitêbê şayîr,
wekî bixûne,
usa bixûne,
ça nivîsîbû kitêbê da –
pê hubrê,
bi hubê...

Çaxê kur xwend – Filankes,
Filankes jî go,
çaxê kur xwend – Bêvankes,
Bêvankes jî go,
ji qulçikê tarî hatin vî alî,
dinya han e ron
bi zora zarê tezevebûyî,
bi zora serê tezefikirî –
mêrxasêd şîera kutasiyê,
Çawa TU û EW:
Yek ça aqilbend,
ê din – gilîgo...

(Çendik çend dewra
paşî mirina şayîrê eyan
her du bûn xweyê warê sor,
xweyê warê şîn...)

Lîstik

Hersêk bi hev ra ketin lîstikê
û usa gurr bû,
û usa nêzîk,
tê bêjî tevî ruhê xwe,
tevî zarê xwe
tevî hişê xwe,
tevî xwe dilîst Xwedêda,
çimkî Filankes bûbû Napolyon –
şer dikir tevî Îskender –
Bêvankesê ra,
Lê... ser kaxeza...
Nav hiş û seyda

Û çaxê dê dît
lîstika zara diltemiz
tevî Filankes û Bêvankesê,
kîjana, hilbet,
him ilm va zor bûn,
him kilama va,
hewasa wê jî pê ra hat,
çimkî ewana
him rast dibirrîn,
him jî çep,
him dikeniyên,
him digiriyan,
him nalê,
him jî bismêl* dixistin...

* **bismêl**: bizmar.

Lê çaxê bav dît, bav, ê ku, hilbet,
zimanzanekî zimandirêj bû,
usa quloz bû û qolinc da xwe,
ku hevt kal û bav pê hesiyan,
anîn ser serê zar-zimanê xwe
zemanê xwe da,
dewrana xwe da.

Lê em vegerin, bên rojêd... Çi Çax,
Gundê Kî Derê,
Ku Filankesê û Bêvankes diman.

Wext Ew Wext Nîn Bû

Wext hebû,
ger yekî digot:
– Porsorê kor e...
Çavê yê gotî derdixist.
Ger yekî digot:
– Tîtalî gêj e...
Serê yê gotî dişikênan,
çimkî her kesî him haj derziya xwe,
Him haj bijûna* xelqê hebû...

Wext ew wext nîn bû,
ne jî meriv bûn ew meriv
û Xwedêda dît,
çawa her kesî qul fikir
him bi derziyê,
him bi bijûnê
dilê binaliyê† gundê Kî Derê,
lê dima bêcab,
bêgune,
bêqeziya,
bêziyan...

* **bijûn**: Digel ku di ferhenginan de wateya vê peyvê wekî “sax”, “bi silamet”, “bi tendurist” û “erdê biadan/biber” derbas dibû jî wekî ku di vê derê de di wateya “şûjin”ê de hatiye bikaranîn ku navê wan derziyên mezin in ku bi wan lihêf û nivîn tên dirûtin/çêkirin.

† **binalî**: akincî, binecih, niştecih.

Ilmê Zimanzan

Kê ku ket devê meriva –
xilazbûn tune,
dev xar e,
guh jî qul...
Kê ku ket devê meriva –
xilazbûn tune:
qaf hişk e,
hiş jî durr...
Zimanzan zû va ew fikir digot,
lê nikaribû îzbat bikira,
kurê wî yî çûk kilît dîtibû
nişkê va, wexta listikê,
çimkî Filankes, Bêvankes pê ra
ber devê evda nesekinîn,
riya xwe dîtin,
çûn mala,
ji mal-mehela,
ne ku çûn,
qey bêjî firîn nolanî teyra,
xeweke şeva
ji destê, destê Xwedêda
bi alîkariya zimanzanê bav.

Xwedêda dabû pey wana,
direviya, diçû malê cînara,
ji mal-mehela,
ku bigire, bîne,
lê, bêjî, meriv hîviya wana bûn
hewcê wana bûn:
yê Filankesê,
yê Bêvankesê
çendik çend qurna,
qey bêjî tiştê ji dinê kêmbû
serê sêrî da
û ew kêmasî hate dîtîne
paşî mirina şayîrê eyan...

Gundê Kî Derê

Hûn ser xarîtê negerin,
ne jî bikevin wir da û wê da,
gundekî çûk e,
bi kirinê xwe – êpêce mezin.
wira jî dijîn merivê nandar,
marîfet, mehrûm,
helal, derewîn,
xweşbext, zêndî,
genî, evsene* ...
Her kes weke bextê xwe
roj derbaz dike
û bi aqilê xwe rê diçe,
direve ber bi nanê xwe...

Çaxê Filankes, Bêvankes
gund da bîter bûn[†],
De, bêderayê xwe hiştin hineka,
hinek dor wana çûn-hatin
û ketin, ketin tefekûriya –
yeziya[‡] herda',
wekî nişkê va şûnda nemînin,
çaxê bela bû ilmê zimanzan,
kîjan vekiribû kurê wî yî çûk,
nişkê va, wextê lîstikê...

* **evsene**: dîn, ehmeq, kawik, xêvik.

† **bîterbûn**: peydabûn, jî "bitmek" a tirkî.

‡ **yezi**: jî "alın-yazısı" ya tirkî. Bi kurdî: çarenûs, qeder.

Û çî qas meriv – ha qas jî aqil,
ha qas jî kirin,
ha qas jî gotin...
her kesa çapa fehmê xwe,
çapa zarê xwe
Filankesê ra, Bêvankesê ra
dikir qîlxê xwe,
dikir dilqê xwe
û fire dikir ilmê zimanzan,
û fire dikir gundê han
çapa dilê xwe,
çapa ruhê xwe
bona Filankes û Bêvankesê...
kê behsa yekê bikira, –
ewan hazir bûn:
yan ser xênî bûn,
yan jî ber dêrî,
ber hev radibûn
mîna tovilê pîvazê:
yekî ra tûj bûn,
yekî ra şîrin,
yekî ra şîn bûn,
yekî ra reş bûn,
yekî ra gul bûn,
yekî ra kul bûn...

Ax, çi dikare Xwedêda bike,
wî halî derxe,
Ji hêna şayîr Filankes,
Bêvankes
serîxwebûn unda kirine,
niha jî her kes berbirî dibe
çapa fehmê xwe:
yek verê dike,
yek pêşiyê diçe...
yek şayê dide,
yek şînê...
yek rûspî,
yek rûreş dike...

Ê, devtêr nîn e, ku lêv bidirûyî,
ne jî otax* e, ku derî bigirî.
Kê wê berê tevşo bide xwe?
Kê wê çavê kor xwe ra bixweze?
Yanê jî bêje: – Dewê min tirş e!

Kêfxirav derdê xwe
dikire çiya,
derdê Filankes û Bêvankesê
nedidît.

* Ji "otax" a farisî, bi kurdî: jûr, ode.

Risqbirr bin lingê wana dikola,
ku dewsa lingê xwe bike.

Çavqul agirê wana ditemirand,
lê kuçikê xwe gurr dikir.

Yê xwekêş mala xwe şên dikir,
mala wan – xirav.

... Usa her kesî kapê xwe diavît
stuyê wana:

Yê Filankesê û Bêvankesê,
xwe jî ji avê ziha derdiket.

her du jî

ne divên: – erê,

ne divên: belê,

ne divên: em in,

ne divên: hûn in...

Car-Cara...

Çaxê zimanzan dît, ku Filankes,
Bêvankes
kerr-lal dikevin dilqêd her kesî,
qilxêd her kesî,
agir hê gurr kir,
ew berî hev da,
çiqas Xwedêda hîvî kir,
ku tiştêd usa bav neke.
Filankes,
Bêvankes
car-cara xûşk kir,
lê xûşkê usa,
wekî mêrê hev ji hev distînin,
lê rû-porê xwe bona hev vedirûn.

Car-cara bira,
lê birê usa, ku her tim
him kêrî hev tên,
him jî hev dixwin.

Car-cara jin-mêr...
lê jinê usa,
wekî mêrê xwe
deqekê dike erd-xwelî,
deqekê dinê radike,
mêr rûspî dike.
lê mêrê usa,
wekî jina xwe rojekê
dike gul,
roke din – kul.

Car-cara bav-kur...
lê bavê usa,
wekî kurê xwe cara ranake,
cara jî dibe pîrê kur,
lê kurê usa,
wekî bavê xwe
yan dike axa, –
serî sond dixwe,
yan jî dikuje, –
gorrê sond dixwe...

Car-cara dê-qîz...
lê qîzê usa,
ku dê hiz dike,
lê pêpes dike, hergê lazim be,
her du lingê dê jî cî hildide,
ku yê xwe dayine.
lê dêke usa,
wekî qîza xwe dide mêt...
Û cihê dike.

Car-cara dost in,
lê dostê usa,
wekî xûna hev dimijin,
car-cara dijmin,
dijminê usa,
wekî bi xêrê
deha bav-birê bêxêr çêtir in:
Yek dibe pira,
Yê din jî ser ra tê-derbaz dibe.

Car-cara yek in, hevalcêwî ne,
çawa zar-ziman û serî,
lê telebext ra yek dixwe,
yek lê dinihêre,
yek xeber dide,
yê dinê nabihê,
yek şînê dike,
yê dinê – şayê...

Her Çar Qulbê Dinyayê

Çaxê Filankes, Bêvankes
bûbûn benîştê nav dev-dirana,
mixê nav qafê her kesî,
bibûn kevçiyê şikestî,
pûnga girara her kesî,
bibûn qîr û sîr,
kor û pûç,
daro-daroyî,
sero-binoyî,
îjar Xwedêda wana bir
ji gund bajara,
ji bajêr – her çar qulbê dinyayê...

Filankes,
Bêvankes
îdî berbirrî meriv bûn.

Û ji arsiza mezinbûn hildan,
ne jî mirin dan,
çimkî wextê da nesekinîbûn
pişta Filankes û Bêvankesê.

Babax zû-zûka serkelê anîn,
yeke wî nekirin dudu.
yê bêbext birin ber behrê,
lê behr miçiqî,
çimkî kasa av nedida.

Gorr kolan,
yê bêkom kirin bin xweliyê –
bêkefen.

Ji merivê bênan dîn-îman hildan
tevî bêpişta hesav nekirin,
çimkî bona zik duşurmîş dibûn.
yê bêtirs timê pê qamçî kutan.
Yê birçî tenê nan danê...
Xewnê da.
Nehîştin wekî yê hêrs bigihîje
nêt-meremê xwe.

Yê neheq birin,
ser neheqî vekirin,
wekî tev bextê xelqê nelîze.

Nehîştin pirrxur têr bixwe,
wekî şev-ro bike qareqar:
– Birçîna mirim!

Heyfhildan

Çimkî merivê dinê yek nîn bûn,
Filankes xwe ra,
Bêvankes xwe ra
ha qas pêş da çûn,
wekî meriva pare ve kirin
ser du îmana, du dîna:

Yê filankesê
yê bêvankesê...
Bona zorê hev bistînin
yek filan welat,
yê din jî bêvan welat saz kirin,
Her du welêt da

ro derdiket ji roavayê,
dewsa baranê steyrk dibarî,
bê pencê royê gul vedibûn,
bêyî havên şîr dibû mast,
çem sekinî bûn,
lê çiya dikişyan...

Qey bêjî meriv paşopê diçûn:
Şivan hîştibû pez li zozana,
esker hîştibû sînore wetan,
cotkar cotê xwe hîştibû bêxweyî
av aş biribû, aşvan ketibû
pey çaqmeqê xwe...

Lê şayîrekî nuh xuliqîbû –
Xwedêda...

Şiêrê Şayîrê Teze

Hê dereng nîn e,
em vegerin bi xwe û ser xwe,
yanê na, meriv,
Filankes xwe ra,
Bêvankes xwe ra
wê ji me hildin xweserxwebûn
wê azayê me ji me bistînin.
Hê dereng nîn e,
em vegerine bi xwe û ser xwe,
ne dinê wana lezim e,
ne jî lezim e bibin mêrxasê
filan welatî
bêvan welatî...
Hê dereng nîn e,
werin, em hiz kin dinya xwe ye ron,
wana jî kiş kin dinya Wî Alî
bê serberate, bê serberate...

Paşxeber

Ji hêna berê, ji wextê şayîr
Filankes xwe ra,
Bêvankes xwe ra,
car-cara hev ra
ne ku sal bi sal,
roj bi roj bi ber bi îroyîn
ne têt, ne diçin,
him têt, him diçin...
Xwedê oxira wan ra be,
Xwedê oxira wan kor ke.

Ne ji dê, ne jî ji erdê
ne bûyî,
ne mirî,
lê ser zar-zimên şimitî,
ji sêrî der û derketî,
ji gava pêşin heta ya paşin
her du jî usa
kurt dibin, çawa metelok,
kûr dibin, çawa meselok,
kevn dibin, çawa gotinok
û teze usa,
ku nêt-xwestinêd yekanî,
ku nêt-xwestinêd pirranî,
perr û perr dikin û diwekilînin
nav hiş û sewda,
dewr-zemana da,
lê him çûk mane, him jî mezin bûne,
him ahil mane, him cahil bûne...
Xwedê oxira wan ra be,
Xwedê oxira wan kor ke...

Helbestên Wî yên di Rojnameya *Riya Teze* de

(1966)*

* Ev her sê helbestên di beşê de, di bin sernivîsa “*Dengê ‘Efrandêd Meye Cahil’*” de di jimara 60 (1808) de ya “*28-ê Îyûla 1966-a*”, digel pesnvedana Elîxanê Memê hatine weşandin ku wê hingê ew xortekî 18 salî bûye. Me di binê her sê helbestan de diyar kiriye bê ka kîjan ji aliyê kê ve ji bo kurdî hatiye wergerandin. Tipguhêziya van her sê helbestan a ji bo alfabeya latînî ya kurdî, cara ewil di blog-sîteya rojnamevan, lêkolîner Îbrahîm Bulak de hatine weşandin. Ji bo lînkê blog-sîteyê, binêrin:

<http://ibrahim-bulak.blogspot.com/search/label/EI%C3%AExan%C3%AA%20Mem%C3%AA>.

Dilê Min

Wexta dor min qûmistan e,
bê av bê ruh, bê îsan e,
mêrga şîn e bona meriya
dilê min.

Wexta dema melûliyê tê
ax û waxê giran dertê,
sîmê zêr e bona meriya
dilê min.

Wexta bahar xweş vedibe,
li sîngê çiyê cew xar dibe,
qalçîçek e bona meriya
dilê min.

Wexta şev e û te'rîstan
hîva sar ji wê nayê xan*,
şemdanek e bona meriya
dilê min.

Wexta sar e, zivistan e,
ba û bager me mêvan e,
kûra germ e bona meriya
dilê min.†

* **xan**: xuyan-î, diyar, darîçav û wd.

† Eskerê Boyîk tercime kir. (têbîniya weşana ewil)

Êvara Çiyê

Dadinizile êvara kerr-lal
li sîngê çiyayê Elegezê şîn,
vedipeşirin gulê terr e al
bi ramûsana bê ye paşin.

Bavê min î gavan dike “hope-hop”
garanê îda ber bi obê tîne,
pêşiyê da diçe diya min berbihêr
“Şegoyê” me beş vediqetîne.

Lê* xûşka min jî li serê qeyê,
hîviya berxvanê xwe hê dimîne,
berxvan bi bilûr pesin û peyê†
huba xûşka min xweş dilîlîne.‡

* Lê: di vê derê de, ne bi maneya gihaneka nakokiyê “bes”, “belam”, “lê”, “lê belê”yê; lê bi maneya “û” ya gihaneka girêdanê ye.

† peyê: bixwîne wekî “paye” jî.

‡ Fêrîkê Ûsiv tercime kir. (têbîniya weşana ewil)

Spindar Îşev

Li baxê me da şev e, şeverêş,
spindar ketiye nav xewa hingor,
çivîk distirê miqamekî xweş,
ku melisiye ser çiçekî jor.

Ez î tenê me li ser banê me
spindara kaw li ber çavê min,
dara zerdela ku kulîlk daye,
dibê: xewn diye spindara şîn.*

* Ji ermenî Sehîdê Îbo tercime kir. (têbîniya weşana ewil)

**Helbestên Wî yên
di Berhevoka 2yem a *Bahara Teze de***

(1983)*

* Jêdera ewil a van her pênc helbestên vê beşê ye: *Bahar N. 2*, hazir kirin: Mikailê Reşîd û Karlênê Çaçanî, Neşîreta Sovyêtekan Grox, Yêrêvan, 1983, r. 142-146. Her 4 hebên ewil ji aliyê Babayê Keleş ve û ya dawî "Kilama Şivan" jî ji aliyê Eliyê Evdilrehman ve hatiye wergerandin.

Kevir

(Kerîk ji poêmê)

Ku xar nebiya barê gê,
Kevir nediçû xerîbiyê*

I.

Bi ga, erebe, cotê xwe yî dar
gundê çiya da
radikir, diçand û dijît bêxem
Tîtal eşq û şa.

Rokê jî dijmin, mîna bagerê,
gîhîşte wira,
egît rabûn, lê... nebû ku bigirin
pêşiya wan gura.
Tîtal bi tiştê lazim e sivik
bar kir gayê zer,
gund hîşt û derket bê dema xatir,
bi kul û keser...

Hela hê çend gav ji ber derê xwe
nekiribû wî,
xurca pišta gê yalîkî† xar bû,
berjêr şiqitî.
Rast kir, lê dîsa xurcîk şiqitî
ser yalîkî gê,

* **xar-[bûn]**: xwar/xwehrbûn.

† **yalîkî**: aliyekî.

giranî miqîm* ber bi xwe dikişîne,
usa ne qewl û qanûnê dinê.
Ku terezû bin herd'† cemê xurcê,
neşiqite bar,
kevirek kire cema sivik da
û ajot Tîtal.
Ga bi gatiya xwe
tê derdixist çi ye...
Ku xayî dajo, dajo û dajo,
lê ne wê derê,
lê ne wê şevê...

II.

Tîtal ga dajot, dajot, û dajot
xeta nenas ra, ji dinê wê da,
ji dinê wê da, xeta nenas ra...
(Wextê ketinê heta atom jî
îza† xwe dertê, riya xwe mêl dibe).

Û her cara ku disekinîn ew
warekî nenas,
tiştêk ji xurcê derdixist difirot
bi dilê şewat.

Difirot çi mabû ji mala rengîn –
bîranîn û derd,
ku heyîtiya xwe bi teherekî§
xweyî ke feqet.

* **miqîm**: 1. mitleq, tekez. 2. her tim, seraqet. Jorborî bi maneya 1em hatiye.

† **herd'**: her du.

‡ **îz**: ji "iz" a tirkî. bi kurdî: dewş, şop, rêç û wd.

§ **teher**: bi awayekî, bi şiklekî. "h" ya di peyvê de ew "h" ye ku ji qirikê tê gotin.

Bi kevir jî tim tim terezû dikir
hin xurca hûr-mûr,
hin jî kul-derdê xwe ye bêhesav,
dilşewat e kûr.

Firotibû wî kofiya dê ye zêr,
û kembera zîv,
gustîla zêr e nîşaniya xwe, ax,
dabû parî şîv.

Û sibekê jî xurca ducem da
tişteke nedît wî,
dewsa nên, tê da kuçê kêvir bû
û qerf valatî.

Tîtal destê xwe cemê da gerand
dîsa û dîsa,
dewsa nên tê da kuçê kêvir bû
û valatiya xem.

Xast heve hûrik jê bipincirrîne,
bavê devê xwe,
lê kevir axir zehf hişk bû, hola*,
û zehf bû kevir...

III.

* **hola**: her çendî mîna rengdêra "hişk"ê, "h"ya vê peyvê jî ji vê qirikê bê bilêvkirin jî, ji ber kêmnasiya wê me bi dabirê ew destnîşan kir. Wekî mezinkirinê timî piştî "hişk"ê tê gotin. mimkin e ku bi erebî be û her bi heman maneyê be.

Tîtal, kevir û gayê pêl î zer
sekinîn ber hev.
Sisêtîke qerf...
Ku yek ji wana ese zêde ye
bi qewl-qirarê evî emrê berk*...

– Tîtal gerekê vegere hela,
gerekê rake zeviya xwe palê,
gerekê rake zeviya xwe jêrê,
bêy gayê zer qe îsal nave...
Kê te bikirre – bêje min, kevir,
kê ra lazim î, çiran î axir, –
Tîtal bi gazin xeber dida xem,
kevir kerr bû, kerr...

Serê xwe dîsa li wê bilind kir
huba dinya ron, hisreta ‘emir,
kîjanê jî wî
kiribû bîrî,
digotê ese,
ku gê bifiroşe...

– Ez, gayê zer ê hela rakin hê
mezîlêd emir,
û zeviyêd zêr e birîndar e gewr,
ku undakirinêd xwe vegeînînin
û paş da bînin...
Tîtal dinaliya, ga dikir berrîn,
... kevir kerr bû, kerr,
ça kevir e kerr...

* **berk**: hişk, saxlem, sert, zexm.

[Tu Zanî]

Tu zanî, dinê
çima teyax* e?
Mîrin çakûç e.
Ew li kêlekê
topa dinya me
evda mîx dike...
Tu zanî, dinê
çima teyax e?

* **teyax:** deyax.

[Anî, Difirim]

Anî, difirim,
lê perr-baskê min
vê bedena min
nikarin hilkin.

Baskê min dil da
vebûne, Anî,
ew min bedenê
dibirrin, dibin.

Anî, difirim,
tu dilê xwe da
hêlûnê çêke
bona min, Anî.

[Ev Dinya Hêk e]

Ev dinya hêk e, –
seresker digot,
kulma xwe digivaşt,
yekî jî dixwest
hêka durengî
bike hêkerûn,
yê dinê dixwest
qeyayê hîvê xe,
lê yê sisiya...

– Ev dinya hêk e, –
seresker digot
û dîsa qayîm
kulma xwe digivaşt.
Û dem buhurî,
kal bû seresker.
Kulma, ku tê da
qeweta mêra
pûngal* danîbû,
bir xwe xwe vebû,
teyrek jê derket
û hewabirr bû.

* **pûngal**: kox, koxik, pînik.

Kilama Şivan

Cem berojekî qeya cînarî
tu rex kaniyê ser pel rûniştî,
avê da dêmê te nûr dibarî,
te çirûs dida, qîza hikiyatî.

Min nêzîkayî çavkaniyê kir
bi dilê evîn, huba kewgirî,
beden min hejiya û dilê m qenc kir,
min û dêmê te hev ra kir laqirdî.

Min destê xwe kir vir nava avê,
ku sifetê te ji wira derxim,
lê heyf, ew şikest, hûr bû wê demê
nav destê min da, ber dilikê min.

Av bin destê min pê da şêlû bû,
şiklê te firiya, çû ji nav kaniyê,
dilê min î kul dîsa mecnûn bû
û em tev hev du hilkişiyane çiyê...

**Helbestên Wî yên di
Berhevoka 3yem a *Bahara Teze* de**

(1984)*

* Jêdera ewil a van her 7 helbestên vê derê, ji vê berhevokê ne: *Bahar N. 3*, hazir kirin: Mikailê Reşîd û Karlênê Çaçanî, Neşireta Sovyêtekan Grox, Yêrêvan, 1984, r. 236-238. Û herweha ji aliyê Çerkezê Reş ve hatine wergerandin.

Mîstêrya

(F. Dostoyêvskî ra)

Me hev du dît,
çaxê nav Xwedê da merî xuliqî,
çaxê Xwedê bîter bû nav mêriv da,
çaxê merî tune bû nav mêriv da...

Me hev hiz kir,
çaxê Xwedê jît nav mêriv da,
çaxê merî jît nav Xwedê da,
çaxê merî xuliqî nav mêriv da.

Çaxê Xwedê unda bû nav mêriv da,
çaxê merî unda bû nav Xwedê da,
çaxê merî jît nav mêriv da,
em mane tenê:
ez, tu û Xwedê,
ber sifetê xwe...

Kilama Hûrmûra ye Kevin û Teze

Ez di nava hûrmûra da yeko-yeko
wa zengila dar da dikim:
Dîng-dong, dîng-dong, dîng-dong...
Û kûraya wan da niha
ez se'eta va radixim:
Tik-tik, tik-tik, tik-tik...
Her çar aliyê mazîlê va,
We'dê çûyî,
dema niha û paşwextiyê
ew kilama zehf nuh distirên,
ew kilama zehf kevn distirên
lêxistina dil ra amin:
Tik-tik, dîng-dong, tik-tik,
dîng-dong, tik-tik, dîng-dong.
Ez di nava hûrmûra da yeko-yeko
ew zengila dar da dikim
û kûraya wan da niha
ez seaetê va radixim,
wekî hûrmûr bên nêzîkî me bin hêdî,
wekî em jî nêzîkî wan hûrmûra bin,
ku em bi xwe... xût* nêzîkî xwe bin îdî...

* **xût**: bi tenê, hew.

Hêraklît*

Û ev dinyalik agir bû
serê sêrî da,
û ew vêsandiyê
barana Rebê alemê.
Her tişt niha vir jî sar e,
dest bidê û pê bihese,
lê mejûyê min, dilê min da
alava êgir nexş bi nexş
hatiye nixamtin...
Û ev dinyalik
nav ruhê min da
hela agir e.

* Hêraklît: Herakleitos.

Talês

Talês

sifetê xwe yî rût-tazî kewkî kiribû*

nav ava hiş û seda ye pîrr sar,

dîfîrand beytê masîgirtinê,

yek-yek derdixist

Xwedê, tişt, ruhber

û cîwar dikir li ber çevê xwe

ça eydanê ruh...

Lê wir Xatûna ava hiş-sewda

bi kel digiriya:

Û hêsir, belê, zelal bûn zehfî,

û hêsir, belê, gef-gurr bûn zehfî,

ku pey beytê ra gelek peyda bû,

û eşqî wana golek peyda bû,

êd masîgir in

û xweyî sifet in...

* **kewkîkirin:** 1. têdakirin. 2. virvirandin. di vir de bi maneya 1em hatiye.

[Bêyî Çiya-Zozan]

Bêyî çiya-zozan kurd tune ne,
bêyî kurd çiyayê xurt tune ne,
kurd fêrizî, her tim şipya
li ser serê çiya bûye çiya.

Û emrê wî çavkanî ye,
bi qal-cengê tev zengê rût,
û her qurnek wî daniye
nav serhatiyê mêrxasiyê xût.

Û bêyî qurne kurd tune ne,
bêyî kurd qurnê xurt tune ne,
kurd fêrizî, kubar-qure
li ser qurnê bûye qurne.

Zimanê Min î Dê

Kurdistana min e nûr da,
ax, welatê nêzîk-dûr da,
zar-zimanê milletê min
lê ne* jêkin hine dijmin...

Lê nizanin, wekî kurd
zimanê çil-çiya ye gendî†,
wekî kurd û zarê çiya
zimanek in...

Kevir dikin ew çavkaniya
wî zimanî,
ku biçike li çiya-baniya,
ku Siyabend bilûrvanî
li Xeca xwe neke deng
ser şivêriya
usa bengî...
... Kevir dikin
kel û kîna hundurê çiya...

* lê ne: dikin, hew/hindik maye.

† gendî: ew bi xwe. ji "kendi" ya tirkî ya cînavka veşerok.

[Ez ber Mêzîna]

Ez ber mêzîna bajarê me me,
meriv dixwezin,
wekî xwe xwe, xwe hebkî rind nas kin,
wekî sifetê xwe vir bibînin,
haj kaşa xwe hebin...

De, şikilkêş[†] ha baxça dijber e, yan jî heykela,
hemî, dîdemêd bedew, hewaskar,
(bo şikilkirinê)
min jî li ser van kevirêd mêzînê
dewsa reqema
nîşana ewan êlêmênta diye,
êlêmêntêd kîmyayê –
zêr, zîv û tîrşza, ser da jî ûran[†] ...
Ez alîkîmîkê wan qurnê orte nîn im
û ne jî
pey Alyaskê dûr, zehf dûr ketime.
Ez xwe ra awa
kevirêd mêzînê datînime ser tay
bi qeydê usa, bê ser û bê sur,
ku êlêmênta bedena we qelp
(hesîn, cehdandin û fikra qelp)
xût tê dibe zêr,
dibe zîv, dibe bronz serdapê...
Ez alîkîmîkê wan qurnê orte nîn im
û ne jî
pey Alyaskê dûr, zehf dûr ketime,
ez xwe ra awa
li ber mêzîna bajarê me me.

* şikilkêş: wênesaz, nîgarkêş, resam.

† ûran: ûranyûm.

Helbestên Wî yên
di Berhevoka 6em a *Bahara Teze* de

(1987)*

* Her 13 helbestên ku di vê derê de ne, ji vê berhevokê ne: *Bahar N. 6*, hazir kirin: Karlênê Çaçani û Eskerê Boyîk, Neşireta Sovyêtekan Grox, Yêrêvan, 1987, r. 22-29.

Zimanê Dê

Min gotê

bi zimanekî din:

– Ez te hiz dikim.

Dê caba min da:

– Ez bawer nakim.

Min gotê

bi zimanekî din:

– Ez te hiz dikim.

Qîzkê caba min da:

– Ez bawer nakim.

Min gotê

bi zimanekî din:

– Ez te hiz dikim.

Êlê cab da:

– Ez bawer nakim.

Min gotê

bi hezar cûre,

bi hezar renga,

bi hezar denga.

Û dê seqirî,

û qîz seqirî,

û êl seqirî..

Şayîro, dêmek, kevin e ew xeber,

û tune bawer,

naxêr, şayîro,

ev xeber dibên,

dê ra, qîzê ra, êlê ra,
çawa zar dixuliqe
û dike qûjîn.

Ez kûr niqo bûm nava xûna xwe,
heta gihîştim sewtêd wan pêşin,
ku kal û bava dabûn xebatê
ber we'dê,
şabûnê,
qeziyayê,
mirinê,
êgir...

Bi van sewtêd kevin min çêkir
xebereke teze û nola zarokê
min kire qûjîn, çawa cara pêşin:
– Ez we hiz dikim...
Û caba min da dinya han e ron
bi sed zimanî:
– Bawer im, lawo...

[Ser Zinarê Hişk Guleke Bedew]

Ser zinarê hişk guleke bedew
bîn û buкса xwe zor direşîne,
bîna beyanî...
Ax, gul bîna xwe
ji dilê zinêr
hiltîne, dibe,
zinar jî digirî...

[Çiya û Çiya]

Çiya û çiya...
Rast e, ez rastê dijîm,
lê dîsa aza,
zexm im ez dîsa...
Çimkî pişt min va,
sekinê ne tîk
sed hezar çiya...

[Diya Min]

Diya min wexta pêz
didoşe,
qulte şîr dihêle
girêşa miyê da:
– Ew jî berxê ra.

Diya min wexta dirûna
nên,
similê gênim dihêle
nav pirêzê da:
– Ew jî mûriya ra.

Diya min wexta birrîna
tîriya,
gûşî dihêle
baxê hêşîn da:
– Ew jî teyra ra.

Diya min
kê ra bêjî, ku parê dernaxe
ji keda xwe,
û xweyî dike dinya han e ron
bi rehma dilê xwe.

[Ji Serê Çiyê]

Ji serê çiyê
min kevir gilor dikir jêr,
wekî bibihê m girmegirma wan.

Pey kevira ra rokê ez çûm,
wekî bivînîm
ku diqedîne û tam dîke rê,
lê mam, temirîm, geliyê kûr da,
ça akkordeke – jî ezmên ketî,
ça steyreke – jî ezmên pekiyayî.

Niha kevira
jî geliyê kûr
yek-yek derdixim li serê çiyê,
mînanî Sîzîf.*

* Sîzîf: Sîsîfos.

[Îdî Çend Sal e]

Îdî çend sal e
ew hîviya min e...
Ez ê dîsa herim
bin konê spî,
gilî kim derd û kulê xwe
û mitalê xwe ber wê birêjim,
wekî ew jî bi gul û gîha
derman ke dil û birîna...
Îdî çend sal e
ew hîviya min e
li serê çiyê...

[Bêyî Yarê]

Bêyî yarê
xewn behra reş e
serê van çiya.

Êvarê,
wexta hîşt û çû
yara min
dil û ruhê min
nav behrê derxist...

Ça xêrxaz, tanê*,
berbanga sibê
destê xwe avêt
ji behrê derxist...

* **tan**: ji tirkî. bi kurdî: berbang.

[Kaxezekê Hilde]

Kaxezekê hilde.
Û tu bikişîne
şiklê teyrêkî.
Hergê bê dayîne
ser dara bilind –
wê hişk be...
Hergê bifire
ji dara bilind –
wê hişk be...
Huba min teyr e,
dilê min jî dar...

Huba Salê

Ber-bedena te
sêsid şêşt û şeş
bişkoşk bûn
û ji zendê te
sêsid û şêşt û şeş
moriê û mircan
bi reng şewq dibûn...

Ser riya kaniyê
moriê-mircanê
zenda zer qetiyân
û tu digeriyayî,
te berev dikir
rêz bi rêz, yek-yek
tevî moriya
kulîlk û steyrk...
te têt ra dikir.

Bilûra min jî
ramûsan dixwest
bi sêsid şêşt-şeş
zaravî...

... Gava min vebû,
riya sîngê te,
Min dît: dilê min,
dilê min têt kirî ye
tevî moriya,
tevî mircana,
steyrk, kulîlka...

Hevrbend

(Bi motifva cimaetê)

Keçikê, em yek in,
teyrêd tek-tek in.

Keçikê, em cot in,
teyrêd tek-tek in,
lê dilê me yek in.

Keçikê, em sê ne,
nolanî horiya ne
ber kûraya behrê
em dihûnin xewna.

Keçikê, em çar in,
ber me çar rê hene,
çar cûr e sozê te,
dua te çar cûr e,
çar qulbê dinyayê ye.

Keçikê, em pênc in,
bira îro şûn da,
tiliyê min xeber din,
tevî tiliyê te.
Ku tama cinetê
hildim vê canê.

Keçikê, em şeş in,
gula serê govendê,
tu van bejin-bala,
tu van memik-sora.
Çavê reş kildayî,
biskê zer badayî,
kê ra qorî kiriye?

Keçikê, em hevt in,
bi hevt kal-bava
ez hisreta te me
û em gulêd bedew in,
ku teze vedibin,
teze dibişkivin,
em in peyhatiyê wan,
em in hişyariya wan...

Keçikê, em pîrr in,
em ê dora royê
govendê bigirin
û xweş bizivirin,
boy hub û seyrê.

Zînê

Berx xalîfîbû
û hevraz diçû
Zînê dabû dû.

Xewn bû yanê bext,
berxik xalîfî,
ber bi pezê min hat.

Westiyabû Zînê,
ba jî vekiribû
bişkokê sîngê wê.

Riya me ye qest
berxik xalîfî
wê rojê kir rast.

[Çiyayê Bilind in]

Çiyayê bilind in,
ez te navînim.

Ji çiyê ba tê,
kilama tîne,
naxêr, bayê sar
derd-kulê yarê
ji çiyê tîne
û ser dilê min
nermik dilîlîne.

Ji çiyê ba tê,
baranê tîne,
naxêr, bayê har
hêsirê yarê
ji çiyê tîne
û ser dilê min
nermik direşîne.

Çiyayê bilind in,
ez te navînim.

[Min Kiras Çêkir]

Min kiras çêkir,
ji belgê biyê,
şev-ro çavê min
maye hîviyê.

Sala hevtan e,
kirasê biyê
agir pê ketiye,
raya min nayê.

**Helbestên Wî yên
di Kitêbên Perwerdehiyê de**

(2012-2014)*

* Her çendî mimkin e ku nivîsandina helbestên vî beşî li dîrokeke kevintir vegerin jî, lê ji ber ku me ew ne ji jêderên yekem ên bi kirîlî, belku me ji kitêbên perwerdehiyê wergirtin ên ku di navbera 2012-2014yê de belav bûne, bi me çêtir hat ku em dîroka jêderên di dest xwe de li vir bidin.

Wê Rabe Madî*

Çiyayê Cûdî
gelek bilind e
ser serê Cûdî
şer e, bager e...
Felek, tu çi ra
usa nemerd î?

“Wê rabe Madî,
bê hewara me...”
Dua-dirozge
badilhewa neçûn,
nava zemana,
felek, tu çi ra
hê çep û qest î.

Rabûye Madî,
tê hewara me,
rabûye Şems jî
ji qulba sibê
tê hewara me...
Felek, tê kengê
bêyî ser rastiyê?

* Elîxanê Memê, *Zimanê Dê (Kurmancî) Pirtûka 2-A*, Weş. Spîka, Yêrevan, 2012, r. 112-113.

Ji zora Madî
û ji nûra Şems
tarî direve,
ji serê Cûdî
soz û sonda
heftê û du mileta
zû va bûye heq,
îdî dibe yek!
Tê kengê, felek,
bînî azadî?

Rabûye Madî,
tê hewara me,
rabûye Şems jî,
tê hewara me...
Felek, tu çi ra
usa me nemerd î?

Dît*

Em usa tí bûn,
usa birçî bûn
ser rê û dirba
ku steyrkê xwe
me ro-nîvro dît.

Em usa xurt bûn
usa birîndar
nav sal-zemana,
ku mirina xwe
me saxe-sax dît.

Em usa bawer,
usa guman bûn
ber nûra Xwedê,
ku welatê xwe
ziyareteke tam dît...

Pê axê hûnand
pê avê hûnand,

* Elixanê Memê, *Zimanê Dê (Kurmançî) Pirtûka 4-A*, Weş. Spîka, Yêrevan, s. (?), r. 87.

Lêgênda* Axê†

Xwedê sparte Melekî Tawis,
wekî peya be ser rûyê dinê,
ji her çar qulba axê bîne,
Adem bihûne.
Ji jorê-jêrê,
ser dinya vala û xiko-xalî,
ax hilda, anî da Xwedê.
Xwedê, tu Xwedê
beşik, dile sax, nêteke temiz
ax hilda ji destê Melekî Tawis,
bi tilî-pêçiyê xwe ye pîroz
bedena Adem afirand-sêwirand,
ruh berda
û şand ser dinê-sirgûnê...
Ji Adem û Hêwa pêş da hat
merivayî,
kîjan bela bû her çar qulba:
Cimaet bi cimaet,
welat bi welat...
Wî çaxî da gelê me
warê para xwe digere
ser rûyê dine, nav her çar qulba,
lê nedîtiye,
ku aza dayîne, konê xwe vegire,
bîna xwe hilde
nava wê beza dirêj e her dem.
Çaxê ku Xwedê bihîst ew gazin,
şaş û metel ma:

* **lêgênd:** efsane, mît. bi îngilîzî, *legend*.

† Elîxanê Memê, *Ziman û Wêjeya Kurdî (Kurmançî) Pirtûka 5-A*, Weş. Spîka, Yêrevan, 2014, r. 3.

“Gelo çawa bû?”

Melekî Tawis gune-gunekar
xwe-xwe mikur hat,
ku ax hildaye ji cîh-warekî,
ne ku ji her çar qulbê dinyayê...
Ew ax jî, hilbet, binga mebûye,
bi çi hatiye çêkirin Adem,
lê ku hatiye birrînê
navka mirovayê...

... Can û bedena benîadem
qesireke tam e,
em qulixçî ne em duaçî ne,
ez jî, bêguman,
zengilçiyê hub û hizkirinê.

Dimdim Diteqe, Dîsa Diteqe*

Ser rûyê dinê
Kela Dimdimê xuliqî
bi destê şuret, xudanê cim'et,
şuxulî geş-nexş nava tebîetê,
mîna xaneke eşq û şa,
mîna kelake têt-tijî,
lê çavnebarî û şextê nezer
Kela Dimdim girt:
Dimdim teqîya hundur va.
Heta îro jî deng digihîje me,
dû-toz hildikişe ber bi ezmana,
çawa şik-şikyat
ber derê Xwedê.
Bi nêt meremê qedimî,
bi saya ruhê afirandar
Kela Dimdimê dîsa ava bû
ser zarê çûk û mezina,
ser lêvê we'de, dem û dewranê,
çawa riknet,
çawa binyata batinî...
... Rabû ber dijmin, rabû ber neyar
bi nexş û nîgar, mêrxas û afat,
mînanî berê, hê zor û qewat.

Ji rohilatê
farisa lezandin ser Kela Dimdim,
çawa bayê Şamê,
Dimdim teqîya,

* Elîxanê Memê, *Ziman û Wêjeya Kurdî (Kurmançî) Pirtûka 6-A*, Weş. Spîka, Yêrevan, 2014, r. 115 – 117.

ji roavayê
hûn qûjîyan ser Kela Dimdim,
mîna marê reş,
Dimdim teqîya,
ereb niznizîn, tatar xizxizîn,
dijminê dinê hatin derbaz bûn,
mîna bagerê, mîna sêlavê,
Dimdim teqîya,
lê teslîm nebû ala azayê,
şax da, şax veda,
çiqas çû, ewqas kela hê çêbûn
ji barê qayîm, ji berê hê zor
destekî da şûr, yê din da şemal,
çimkî çavê xwe negirt
ber qulba sibê,
qencî-xiraviya din-alemê
navît pişt guha,
kire elekê, kire bêjingê,
da ber hesavê bayê bêderê...
... Nava cinetê Adem sêv tam kir,
Dimdim teqîya,
Kayên birê xwe, Abêl lêxist kuşt,
Dimdim teqîya,
tofan ku rabû dor berê Cûdî,
Dimdim teqîya,
Îsa derxistin ser xaçê cezê,
Dimdim teqîya,
Osvênsiyûm dû kir,
Dimdim teqîya,
Bombe avîtin
Ser Nagasakî, Hêroşîmayê,
Dimdim teqîya,

Îdî navêjim Helebçê,
bîra me bînin Zîlanê,
Dimdim teqiya...

Dimdim bilind e, gelek bilind e,
dinê xuyan ser kefa desta,
navê sê wexta û her çar qulba:
Bo devê neheq, Dimdim diteqe,
meriyê bêwelat, Dimdim diteqe,
teyrê bêperr - bask, Dimdim diteqe,
pezê bêşivan, êla bêserî,
behra bêgemî, çiyayê bêberf...
Dimdim diteqe, der û hundur va,
mîna dilê min:
Ew hem pola ye, hem jî nazik e.

Ew çi dinêke virr-direwîne,
ev çi dinêke axirîzemîn e?

Dimdim diteqe, dîsa diteqe!

Şayîr*

Qîz Berrojî bû,
kur jî Kendalî:
Her du ewladê çiyakî,
lê kê orta wan
şûr anî – danî,
go: yek Berrojî,
yek Kendalî ye,
zewac ne cayîz e.

(Hêsrên Berrojê
diçû Kendala,
of-axê Kendêl
dikişe Berrojê...)
Kûrma hizkirinê
şûr heland usa
wekî şûr bû gul...

Him Berrojî me,
him jî Kendalî,
tême xuyanê,
çawa çiyakî,
cî heye sert im, –
çawa şûr,
cî heye nazik, –
çawa gul,
nazikayî-sertî
nav şayîrekî...
Dibe nûr.

* Elîxanê Memê, *Ziman û Wêjeya Kurdî (Kurmançî) Pirtûka 6-A, Weş. Spîka, Yêrevan, 2014, r. 3.*

Çito Çiya me?*

Çiyayê bilind perda tariyê
dide alîkî,
dikeve tora baharê
dikeve tora berbangê
bi hezar rewşa, bi hezar nexşa,
vedigere ser xwe:Çito çiya me?
Berê xwe didim ber dêra çiyê
çavê duaçî li ezmîn:
Her çar aliya têtî dîtîne,
mirîd çiya yî!
Ez cabê didim.

* Elîxanê Memê, *Ziman û Wêjeya Kurdî (Kurmançî) Pirtûka 6-A*, Weş. Spîka, Yêrevan, 2014, r. 97.

Helbestên Wî yên
di Çanda Kurdên Sovêtê de

(2019)*

* Me ev parçe-helbestên vî beşî ji xebata Dr. Eskerê Boyîk ya bi navê Çanda Kurdên Sovêtê wergirtine, sala ku me weke jêder nîşan daye, ne sala çapa yekem a van helbestan e ku Dr. Eskerê Boyîk di nav jêderên xwe de aniye, belku sala çapa xebata wî bi xwe ye. Ji ber keda bi salan a cenabê Dr. Eskerê Boyîk, me dest di tîpguhêziya wî werneda. Herweha divê bê gotin ku di xebata navborî de van parçe-helbestan sernavek jî nîn bû, ji ber vê egerê me jî ew wekî awayê wan ê heyî, “bêsernav” hişt.

... Niha konê me qet qet dirize
Goşê malê da,
Hîmê kîjanî dijmin hildişand.

Ka kê dizane, yanê bîr tîne
Wan qetê kon da çika heye?
Terîqeke zor wî ra dirize...

Ez şevê razam,
Rojê hişiyar bûm,
Inê razî ma.
Ez rojê razam,
Şevê hişiyar bûm,
Bavo razî ma.

Şevê hişiyar bûm,
Rojê hişiyar bûm,
Xwedê min raza.
Ez şevê razam,
Xwedê hişiyar bû.

... Tev te çi bikim
Ro-bê roj, bê şev.*

* Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovyetê*, Stenbol: Weş. Peywend, Stenbol, 2019, r. 444-445.

